Rupel 1welat++++++:Layout 1 18.09.2010 17:27 Page 1

# Ji bo perwerdeya bi kurdî BOYKOT




**Gelê kurd ji bo zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê xwedî li biryara TZPKurdî ya boykotkirina dibistanan derdikeve. Malbatan diyar kir ku ji bo pêşerojekê ji zarokên xwe re amade bikin dê zarokên xwe neşînin dibistanan. Her wiha piştgiriya ji bo boykotê her diçe berfirehtir dibe**

## Boykot mafê de rewa yê xozayî yo

Sereka pêroyinê Egîtim Senî Zubeyde Kiliç ard ziwan ke, boykotkerdişê mafê kurdan yê xozayî yo. Kiliçi bertekanê xo, semedê ke vatibi, kurdîy dibistanan boykot kenêy ra, welîyanê gedeyan tehdît kerda ra nîşan da û waşt ke, heme kurdîy gedeyanê xo meeşrawê dibistanan... *R.9*

## DUŞEMÊ NAÇIN DIBISTANÊ

Kurdên li Stenbolê piştgirî dan kampanyaya TZPKurdî ya boykotkirina dibistanan û diyar kirin ku ew ji duşemê heta hefteyekê zarokên xwe naşînin dibistanan. Platforma Çareseriya Demokratîk a Aştiyê ku ji 44 saziyan pêk tê piştgirî da boykotkirina dibistanan. Her wiha dewletê ji tirsan avêt ser KURDÎ-DER'a Êlihê... *R.5*

www.welat.com

# Rojeva Welat

19 Îlon 2010 Yekşem Buha: 50 Kr Hejmar:12

E-mail: awelat2002@yahoo.com

Perwerdehî bi zimanê kurdî xweş e... Samî TAN R.2

Ziman û Xweseriya Demokratîk... Erdogan ALTAN R.8

**HEVSEROKA BDP'Ê GULTAN KIŞANAK JI BER KU ERDOGAN SERSAXÎ JI COLEMÊRGIYAN RE NEŞAND REXNE KIR:**

# Tu ne serokwezîrê kurdan î

Ligel ku bi awayekî aşkera bûyera Colemêrgê ji aliyê hêzên kûr ên dewletê hatiye kirin jî hikûmet û çapemeniya wê dixwazin civakê manîpule bikin. Hikûmeta AKP'ê sersaxî ji gelê Colemêrgê nexwestiye

### BÊYÎ RASTIYÊ BIZANIBIN DIAXIVIN

Heyeta BDP'ê ku hevserokên BDP'ê jî di nav de çûn gundê Peyanisê. Di ziyareta konê sersaxiyê de Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, destnîşan kir ku Serokwezîr û Serokomar bêyî rastiyê zanibin û lêkolîn bikin li cihê xwe dozgeriyê dikin û gel tawanbar dikin. Kişanak, anî ziman ku berpirsiyar dewlet e û xwest rastî bê zelalkirin.

### DI SERÎ DE GELÊ KURD SÛCDAR DIKÎ

Kişanak, destnîşan kir ku ji ber helwesta dewletê veqetîneke hestiyarî pêş dikeve û got heta niha serokwezîr sersaxî nexwestiye û wiha got: "Di vê bûyerê de evqas pirsên ku hene, serokwezîr derdikeve partî û gelê me sûcdar dike. Serokwezîrê ku bersiva van pirsên me nede ne serokwezîrê Colemêrgê ye. Ne serokwezîrê kurdan e."... *RÛPEL - 4*

### TILIYA JÎTEMÊ Û ZAROKÊN BAŞ

Nûnerên partiyên siyasî têkildarî komkujiya gundê Peyanisê ya 10 kesî jiyana xwe ji dest da, diyar kirin ku kesên nexwazin pirsgirêka kurd çareser bibe ev komkujî pêk anîne. Nûnerên partiyan anîn ziman ku li gorî delîlên derketin holê JÎTEM û "zarokên baş" ên bi sedan komkujî û bi hezaran "bûyerên kiryar nediyar" pêk anîn nîşan dide... *RÛPEL - 4*



## Jinên kurd li Duhokê civîn li dar xistin

Heyeta jinên kurd ên Tirkiyeyê ku di bin serokatiya Parlementera DEP'ê Leyla Zana de hatin cem hev, li Duhokê yekemîn civîna xwe pêk anî. Di çarçoveya xebatan de li Duhokê bi beşdariya jinên kurd yên ji Tirkiye, Iran, Iraq û Sûriyeyê civîna yekem pêk anîn. Civîna jinan dê du rojan berdewam bike... *RÛPEL - 7*




**Kujerên Apê Mûsa pirsîn**

*Di çalakiya ku ji aliyê ÎHD û lêzimên windayiyan ve her hefte roja şemiyê bi dirûşma 'Bila winda bên dîtin, fail bên darizandin' pêk tê vê hefteyê ji bo Apê Mûsa pêk hat. Çalakî li Amed, Êlih û Rihayê jî hate lidarxistin...* ***RÛPEL - 3***



## Dêrsimijan bendavan ra vat 'NÊ'

Dêrsimî di bendavanê ke îhale girotê û dest bi viraştişa Karatepe-1 û Haratepe-2 kerdîy. Qabê xebatanê sontajî şîrketa ke îhale girotêy ra, Hazal Hîdroelektirîk amebi cayê bendavan ke bixebityê. Eme şarê Dêrsimijî û dewijanê dormeyî bertekanê xo yê tûnd nîşan day... *DIMILKÎ R.9*

# 'Divê çareserî pêk bê'

Komîsyona Aqilmendan piştî gera xwe ya li Amed û Stenbolê daxuyaniyek da û diyar kirin ku ew ne navbeynkar in lê dişopînin û divê Tirkiye pirsgirêkên xwe çareser bike

Serokê "Komîsyona Aqilmendan" û Serokomarê Fînlandiyayê yê berê û Xelatgirê Nobela Aştiyê Marttî Ahtîsaarî ku ji ber tecrûbêyên wî yên berê pênaseya navbeynkar lê dikin û nêrîna xwe ya kesane ya der barê pirsgirêka kurd de jî wiha vegot: "Li welatekî wekî Tirkiyeyê ku nêzî 40 nijadên cuda hene, lazim e pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bike. Lazim e ev pirsgirêk di nava hemû civakan de bikevin rojevê û bêne çareserkirin. Neçar in niqaş bikin û çareser jî bikin."... *RÛPEL - 4*




## 'Dewleta Kûr' kiriye çimkî...

Ev êriş 'Dewleta Kûr' kiriye. Çimkî bi awayekî fiilî jixwe bersiv neda biryara bêçalakîtiya PKK'ê û operasyon li ser hev meşandin. Çimkî vê dewletê ji bo muzakere pêk neyên, Serokomarê xwe Turgut Ozal jî kuştiye... *T. TEMEL R.2*

## Pirsên li benda bersivê

Ligel delîl û çavdêriyên welatiyan dîsa rayedarên hikûmetê û çapemeniya tirk israr dike ku bûyerê têxe stûyê PKK'ê û ser bûyerê bigire. Gelek pirs hene li benda bersivandinê ne, lê hikûmet li şûna bibersivîne gel sûcdar dike... *R.8*

## Pêla derewên çapemeniya tirk

Li Colemêrgê piştî teqîna bû sedema mirina 9 kesan, dijberî daneyên derketine holê, ji roja yekem û vir ve hin saziyên çapemeniyê berpirsyarê bûyerê îlan kirin, roja duyem jî bi senaryoyên nû weşanên xwe domandin. Bi nûçeyên derewîn dixwazin civakê manîpule bikin... *R.2*

# Dîsa derewên çapemeniyatirk

## Şahidên bûyerê ligel ku bûyer wekî karê dewleta kûr nîşan dan jî AKP û 'çapemeniya alîgir' ev bûyer dixwazin bixin stûyê PKK'ê. Çapemeniya tirk bi derewên xwe civakê manîpule dike

**STENBOL / DÎHA** - Li Colemêrgê piştî teqîna bû sedema mirina 9 kesan, dijberî daneyên derketine holê, ji roja yekem û vir ve hin saziyên çapameniyê berpirsyarê bûyerê îlan kirin, roja duyem jî bi senaryoyên nû weşanên xwe domandin.Li gundê Peyanîsê yê Colemêrgê ku di dema minîbûsek sivîl derbas bû de teqînek qewimî û di encama wê de 9 kesan jiyana xwe ji dest dan û şahidên bûyerê jî bûyer wekî karê dewleta kûr nîşan dan lê AKP û

"Çapemeniya alîgir" ev bûyer çareser jî kir! Rojnameyên Star, Sabah û Zaman ku gotina Serokomar Gul, Serokwezîr Erdogan û Wezîrê Karên Hûndir Atalay a "Lêpirsîn didome, lê PKK'ê kiriye" wekî fermanê fêm kirin û bi senaryoyên sosret manîple dikin.

**Şahidê wan sercerdevan e**

Rojnameya Starê, di manşeta "Armanc heman e, navnîşan heman e" de di nûçeya bi îmzeya Şehmus Çakan û Ebrû Baran de, angaştin ku malbatan di morgê de nerazîbûn nîşanî BDP'iyan dane.

Nûçegihanên Starê dijberî dirûşmên girseyê gêriyan ên di televizyonan de hema hema zindî hatin weşandin, dirûşmeyên xeyalî afirandin û îdia kirin ku dirûşmên bi kurdî û tirkî yên "Kujer PKK'ê" û "Şehîd namirin welat nayê parçekirin" berzkirine. Palpişta rojnameyê jî tenê Serokê Komeleya Cerdevanan Alî Haydar Yener e. Rojnameyê di berdewamê de jî teqîna li Gungurenê ya têkiliya wê ya bi Ergenekonê hat tesbîtkirin û êrîşa li Hemkayê ya tê gotin ji aliyê JÎTEM'ê pêk hatiye jî angaşt ku PKK'ê kiriye.

**'Sabah senaryo kûrtir kir'**

Rojnameya Sabahê ku duh berpirsiyarê bûyerê dît a zavê Serokwezîr Erdogan tê de dixebite jî, di nûçeya bi sernavê "qetilkirina tolhildanê" da di navbera êrîşa li hêrêmên Bineh û Binevşanê ya 9 HPG'iyan tê de jiyana xwe ji dest dan û ya gundê Peyanîsê de avakirina têkiliyê jî îhmal nekir û îdia kir ku li gel li heman herêmê ne li ser îxbara gundayan "PKK'ê tol girtiye". Sabahê jî ku tiştên şahidan û gundiyan gotin li ber çavan negirt, kesê perê hevdîtin kirin jî tenê serokê komeleya cerdevanan bû. Rojnameya Sabahê ku saloxgeriya cudakarî jî derbas kir manîpuyên xwe bi senaryoyekê bi hêz kir û ev tişt gotin:

"Çalakiya mayînê ya li Colemêrgê, ji aliyê alîgirên şîdetê yên di nava rêxistinê de, koma di rêberiya Bedîrhan Abo yê bi navê kod (Masîro) yê girêdayî Fehman Huseyîn (Bahoz Erdal) ê di asta rêberê bazan de yê ji Sûriyeyê de ve pêk hatiye." rojnameyê îdia kir ku "êrîş ji ber şerê desthilatdariyê yê di navbera Murat Karayilan yê bi navê kot 'Cemal' û Fehman Huseyîn de ye."




Rojnameya Zamanê jî ku manşeta duh nedît senaryoyê diqedîne. Di rojnameya bi manşeta "piştperdeya êrîşa li Colemêrgê vedibe" derket, angaşt ku di nava PKK'ê de şerê desthilatdariyê heye û hewl dide qetliamê bixe ser milê PKK'ê.

Di nûçeyên hevpar ji bo hersê rojnameyan re hat servîskirin de, naverok û zimanê hatibû bi kar anîn hema hema wek hev bûn. Dijberî dane û belgeyên derketin holê, balkêş e ku nûçe spartine senaryoyên bê bingeh.

**Bal kişandin ser delîlan**

Rojnameyên wekî Milliyet û Radîkalê ku bûyer bi zêdehî bi pirsan dan, rojnameyên Birgun, Evrensel û Tarafê jî balkişandin ser delîlên derketin holê û hezên li pişt qetliamê ne. Rojnameya Tarafê tesbîta hevserokê BDP'ê Selehattîn Demîrtaş a û şahidan anî ziman a "Mayîn heye, mirin heye, operasyon nîne" hilda manşeta xwe.



Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

# Perwerdehî bi kurdî xweş e!

Li hemberî helwesta berzeq a rayedarên dewleta tirk mirov nizane çi bike û çi bibêje. Li aliyekî çeteyên wan me dikujin, li aliyê din jî radibin li ser termê me polîtîkayê dikin. Her cara ku tîrêjên aştî û çareseriyê xwe ber didin ser axa welatê me, kujerên dewletê wekî şevşevokê ku ji roniyê ditirsin, êrîşî gel dikin û xwîna mirovan dirêjin. Bi salan e wiha didome, kengî Tevgera Azadiyê agirbestê îlan dike, kengî ji bo aştî û çareseriyê hinekî hêvî çêdibe, ew hêzên tarî derdikevin holê. Di arîfeya Cejna Qurbanê de 9 gerîla, niha jî 9 mirovên sivîl hatin kuştin. Serokwezîr Erdogan li şûna ku bi pey kujeran bikeve, parêzeriya kujeran dike.

Hem dixwazin kurd dest ji çekan bikêşin, hem jî her cure çalakiyên me yên demokratîk terorîze dikin. Hemû aqilmendên hikûmetê yên lîberal û qelemşûrên çapemeniya alîgirê AKP'ê dibêjin, "Bila kurd destên xwe ji şer vekêşin, bila ji bo daxwazên xwe çalakiyên sivîl û demokratîk bikin." Lê rayedarên dewletê her çalakiya kurdan a demokratîk û sivîl wekî teror bi nav dike û bi tundî bi ser de diçe. Binêrin, aktîvîst û têkoşerên zimanê kurdî ji bo mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê, banga boykotê li malbatên kurd dikin, lê Wezîrê Perwerdehiyê Çubukçu gefan li malbatan dixwe, dadgeh afîşên TZPKurdî qedexe dike. Ka em ê çawa ji vê dewletê bawer bikin, em ê çawa xwe bispêrin însafa vê dewleta ku bi her awayî doza qirkirina me dike? Ez naxwazin zêde gotara xwe dirêj bikim, vê hefteyê min divê ez nivîsa xwe bi daxuyaniya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ku me roja 17'ê mehê di civîna çapemeniyê de xwendiye, biqedînim:

*"Serdemeke nû ya perwerdehî û hîndekariyê dest pê dike. Ji bo gelek di jiyana wan de destpêka qonaxeke nû. Gelek zarok dê vê rojê wekî rojeke xweş bi bîr bînin. Lê hinek zarok hene ku dê ev roj bibe destpêka gelek zor û zehmetiyan. Gelek zarok dê ji nişka ve bi zimanekî nû re rû bi rû bimînin. Bi mehan bêyî ku tiştekî fêm bikin dê li mamosteyê/a xwe temaşe bikin.*

*Piştî demekê bi derengî û dijwarî be jî dê hînî zimanê dibistanê bibin, îcar hêdî hêdî dê ji zimanê xwe dê û bavên xwe dûr bikevin. Ew ê hêdî hêdî dê zimanê wan ê zikmakî qels û lawaz bibe, piştî demekê êdî dê ji zimanê xwe yê malê şerm bikin û bi tenê zimanê dibistanê bipeyivin. Belê her sal ev çîrok dubare dibe, her sal zarokên kurd vê êş û janê dikêşin, tûşî vê aqûbetê dibin. Hinek ji wan zarokan digel hemû astengiyan jî li zimanê xwe xwedî derdikevin, bi derfetên xwe hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê dayika xwe dibin. Bi piraniya wan zarokan heta ku hebin vê êş û janê ji bîr nakin, naxwazin ku zarokên wan ji vê êş û janê bikêşin. Lewre hinek ji wan ji kurdî direvin, bi zarokên xwe re bi kurdî napeyivin, wan bi tirkî mezin dikin, lê ev jî birînê derman nake, lewre îcar zarokên bi tirkî mezin dibin, ji çanda xwe ji dîroka civaka xwe, ji zimanê dê û dapîrên xwe dûr dikevin.*

*Ji ber vê yekê gelek mirov dixwazin dawî li vê karesatê were, êdî zarokên wan bi zimanê dê û bavên wan bêne perwerdekirin, zarokên xwe bi lorîk û çîrokên kurdî perwerde bikin. Ji bo vê yekê bi hezaran malbat serî li midûriyetên perwerdehiyê didin doza perwerdehiya bi zimanê xwe dikin, lê rayedarên dewletê guh nadin daxwazên wan. Pirî caran daxwaznameyên wan bêbersiv dimînin, hin caran jî dibêjin, "Ji ber xala 42'yan a makeqanûnê daxwaza we hatiye redkirin." Îsal li hemberî vê yekê malbatên kurd bi pêşengiya Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî (TZPKurdî) biryar da ku zarokên xwe bo hefteyekê neşînin dibistanê da ku ev qirkirina spî bi dawî bibe. Em jî wekî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi dil û can piştevaniya vê daxwazê û vê çalakiyê dikin. Em dibêjin êdî bes e, bila zarokên me bi zimanê kurdî perwerde bibin, bila çanda me ji holê ranebe. Gelê kurd êdî naxwaze zarokên wan vê zilmê bijîn, dixwaze çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bike, dixwaze bi xwe xwe rê ve bibe. Ji bo vê yekê doza xweseriya demokratîk û perwerdehiya bi zimanê dayikê dike. Em bang li hemû mirov demokrat û azadîxwaz dikin û piştevaniya vê daxwaza malbatên kurd bikin."*

# XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Paytexta Bolîvyayê... Hêjmarek **2.** Cure, celeb... Roja em tê de ne **3.** Xwarina sereke... Kesê ji gelê Polonyayê an jî, ji eslê vî gelê **4.** Tiştê ku pê debar tê kirin **5.** Werz, mewsîm 6. Kanaleke televîzyonê ya muzîkê ya kurdî... Notayek **7.** Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Yezdanekî misrî **8.** Organên hundirîn... Dijbera germ **9.** Rojek... Ji dew tê çêkirin, toraq

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Dua, niyaz... Di lîstikê de dor **2.** Bi soranî 'av'... Kund **3.** Lewheya ku tiştan li serê dinivîsîn an jî danebihîzan pê ve dikin... Kuriya mehînê **4.** Genimê hêrandî... Demên rojê **5.** Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû **6.** Kesê ku di karekî de xwedî rayeya fermankirinê ye **7.** Notayek... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin **8.** Bazirganê ku zadî dikire û difroşe... Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin **9.** Ji bo ajotina keran tê gotin... Xweliya piştî şewatê

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Ş | Î | V | ■ | M | A | L | ■ | Ş |
| 2 | A | D | ■ | Ş | Û | R | ■ | N | O |
| 3 | N | ■ | Z | O | ■ | D | R | A | M |
| 4 | O | P | E | R | A | ■ | Ê | M | ■ |
| 5 | G | E | R | ■ | B | A | B | E | K |
| 6 | E | Z | ■ | G | O | R | E | ■ | I |
| 7 | H | ■ | S | A | R | ■ | R | A | Z |
| 8 | ■ | L | A | ■ | Î | N | ■ | J | Î |
| 9 | K | O | F | Î | ■ | A | B | O | R |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 4 | | | | | ■ | | ■ | | ■ |
| 5 | ■ | | ■ | | | | | | |
| 6 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 7 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 8 | | | | | | ■ | | | |
| 9 | | ■ | | | ■ | | | | |

Deng

## 'Dewleta Kûr' kiriye çimkî…

TAYÎP TEMEL tayiptemel@walla.com

Tevgera Siyasî ya Kurd ligel hemû tahrîk, qetlîam û înkarên fermî yên dewletê bi yek dengî banga bêçalakîtiyê kir û PKK'ê jî ligel hemû zehmetî û zoriya ev bang bi awayekî erênî bersivand.

Hikûmetê wisa plan dikir ku di dema dengdan û propagandaya referandûmê de li Kurdistanê rewş aram bibe û bi vî rengî bikare propagandaya 'kurd jî alîgirên guhertinê ne û dê bêjin erê' bike. Armanc ew bû ku kurdan manîpule bike û rewşa bêçalakîtiyê veguherîne ranta siyasî. Lê ne PKK'ê û ne jî kurdan li van hesabên biçûk mêze nekir û heta 20'ê îlonê biryara bêçalakîtiyê da. Hin kurdên ku xwe bi dewletê xwedî dikin, bi israr xwestin ku kurd bibin piştgirên AKP'ê û ji polîtîkayên wê yên ku ji înkara Kenan Evren û Tansu Çîller qet ne cuda ne re bêjin 'erê'. Yanî wan derdoran ji bîr kir ku kurdan ne li hemberî Evren ne jî li hemberî Çîllerê serî netewandiye û lewre li hemberî polîtîkayên AKP'ê yên ku bi tenê li ser xapandina kurdan hatine avakirin jî serî natewînin.

Ligel biryara bêçalakîtiyê ya Tevgera Kurd jî helwesta BDP'ê ya boykotê li gorî dilê AKP'ê neguherî û kurdan bi piraniyeke mezin sindoq boykot kirin.

Colemêrgê di mijara boykotê de rekora hemû deman a Tirkiyeyê şikand.

Her wekî AKP'ê û çapemeniya girêdayî îdia dikir li tu deverên Kurdistanê di roja referandûmê de bûyerên neyînî neqewimîn kes nehate tehdîdkirin.

Beriya cejnê li Colemêrgê 9 gerîla bi awayekî hovane hatin qetilkirin û dîsa jî ligel hemû hêrs û aciziya gelê kurd û gelê Colemêrgê PKK'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku çiqas hikûmet rewşê tahrîk bike jî ew ê heta 20'ê îlonê biryara xwe ya bêçalakîtiyê bidomînîn. Tam jî di demeke ku Colemêrg bi girêdana xwe ya polîtîkayên Tevgera Azadiya Kurd hatiye rojevê li gundekî ku ji sedî 99 tevli boykotê bûye, di bin minibûsekê de teqîneke pêk hat û cihê bûyerê veguherî gola xwîna zarok, jin û sivîlên bêguneh. Ji dema pêkhatina bûyerê heta dawiyê min jî wekî rojnamegerekî bûyer şopand. Me ji gundiyan û çavkaniyên herêmî agahî wergirtin. Hemû îşaret û daneyên li cihê bûyerê nîşan didin ku tiliya hêzên kûr ên dewletê di vê bûyerê de heye. Kîjan kesan pêk anî, kê ew teqemenî li wir bi cih kiriye lazim e bê aşkerakirin. Lê di bin bûyerê de îmzeya 'dewleta kûr' heye. Lê hin rojnameyan û rayedarên hikûmetê bi awayekî balkêş û ecêp rasterast ketin parastinê û şûna ku hesabê bipirsin ka kê bi vê bûyerê pêşî li hevdîtina Hikûmet û BDP'ê girtiye, rasterast bûyer avêtin stûyê PKK'ê. Dema mirov li daxuyaniyan û vê psîkolojiyê mêze dike, her wekî kesên sûcdar tevdigerin. Çima hûn şûna ku kurdan sûcdar bikin, pirsa 'PKK'a ku di rewşa bêçalakîtiyê de ye çima tiştekî wisa bike?' û 'Faydeyê wê di bûyereke bi vî rengî de çi ye' napirsin.

Tevgera Kurd a ku ji bo hêviya diyalog û muzakereyan ligel domandina operasyonên leşkerî jî bêçalakîtî îlan kiriye çima tiştekî wisa bike? Heke hewcedarî bi tiştekî wisa bibîne çima li Colemêrgê pêk bîne.

Bersiva vê pirsê pir zehmet e. Çimkî kirin, rewş û pirs li hev nakin.

Lê pirsa 'Dewleta Kûr' çima vê bûyerê pêk bîne?' xwedî gelek bersivan e.

Ev êrîş 'Dewleta Kûr' kiriye.

Çimkî bi awayekî fiilî jixwe bersiv neda biryara bêçalakîtiya PKK'ê û operasyon li ser hev meşandin.

Ev êrîş 'Dewleta Kûr' kiriye.

Çimkî vê dewletê ji bo muzakere pêk neyên, diyalog çênebe Serokomarê xwe Turgut Ozal jî kuştiye.

Ev êrîş 'Dewelat Kûr' kiriye.

Çimkî Serokwezîrê vê dewletê beriya çend rojan ferman da saziyên girêdayî xwe yên ewlekariyê ku 'hebûna dewletê' li Colemêrga bi boykotê rekor şikandiye, bide hîskirin. Wan wisa fêm kir û dewlet da hîskirin. Divê rayedarên vê dewletê baş bizanin ku kurd ne ehmeq in û nabe ku êdî li nûçeyên şerê taybet guhdarî bikin. Heke piştî çûna Başbug AKP'ê û Artêşê li hev nekiribe, divê Erdogan hemû hêza xwe bixe dewreyê û hesabê ji qatilên di nava dewletê de xwe veşartiye bipirse.

# Di nava 10 rojan de 20 cenaze

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED

Di 7'ê îlonê de li herêma Bileh û Binefşan 10 gerîla hatin qetilkirin. Di 16'ê îlonê de li Peyanisê 2 jê zarok 9 gundî hatin qetilkirin. Enver Turanê di roja yekemîn a cejnê de hatiye birîndarkirin pêr jiyana xwe ji dest da. Di nava 10 rojan de Colemêrgê 20 cenaze rakirin.

Li Colemêrgê qetl û xwîn e. Roj naçe ku agahiyên şer û pevçûnan ji vî bajarî neyên ragihandin. Bajar ji Beyrûdê jî, ji Gazzeyê jî aloztir bûye. Hêzên dewletê bêyî ku pêdivî bi xwe veşartinê bînin, roje nîvro qetlîaman pêk tîne. Di nava 10 rojên dawî de ji bajarî 20 cenaze hatin rakirin.



**Ferqa Colemêrgê ji Beyrûd û Gazzeyê nema. Maye ku balafirên dewletê bajêr gulebaran nekiriye. Di nava 10 rojan de jin û zarok jî di nav de 20 kes hatin qetilkirin. Enver Turanê 15 salî bû 'qurbanê' dawiyê**

**10 gerîla qetilkirin**

Colemêrg, demeke dirêj e di nava bultenên nûçeyan de rêza yekemîn bi tu deran re par nake. Agahiyên qetl û xwînê ji vî bajarî belavî tevahiya cîhanê dibin. Di 7'ê îlonê de li herêma Bileh û Binefşan gerîlayên HPG'ê yên ji ber biryara bêçalakîtiyê xwe vekişandibûn kozikên xwe û şer nedikirin, bûn hedefa hêzên dewletê. Zêdetirî 10 hezar leşkeran li hemberî gerîlayên li Çiyareşkî cihê wan hatiye tespîtkirin operasyonek da destpêkirin. Di encama operasyonê de ku di arefeya Cejna Remezanê de pêk hatî de 10 gerîla hatin qetilkirin.

**Enver bû hedef**

Ligel vê qetlîamê li tevahiya Bakurê welat cejn wekî 'Cejna Reş' hate îlankirin û çalakiyên girseyî pêk hatin. Yek ji van çalakiyan jî li Colemêrgê pêk hat. Di roja yekemîn a Cejna Remezanê de xwepêşandaneke gel pêk hat. Polîsên dewletê êrîşî gel kir û di nava demeke kurt de pevçûn li tevahiya bajar belav bû. Çawişekî pispor Enver Turanê 15 salî hedef girt û birîndar kir. Enver piştî 7 rojan di komayê de ma pêr jiyana xwe ji dest da.

Gelê Colemêrgê ku demeke dirêj e benê di navbera xwe û dewletê de qedandiye, di referandûma 12'ê Îlonê de bersiva xwe ya herî zelal da dewletê. Ji bilî polîs û rayedarên dewletê li Colemêrgê tu kes neçû ser sindoqan. Dema polîs, leşker û rayedarên dewletê jê bêne vederkirin, rêjeya boykotê li Colemêrgê ji sedî sed bû.

**Qetlîma Peyanisê**

Hêzên dewletê, 'bilezgînî' bersiva boykotê da. Di 16'ê îlonê de kemîn li ser mînîbûsa ji Peyanisê dihate bajêr danî. Mayin di nava asfaltê de hate cihkirin û bi kabloyê hate teqandin. Encam 9 mirî, 3 jî birîndar. Bi vê qetlîamê hejmara cenazeyên ji Colemêrgê hatine rakirin bû 20.

**Dikarin her tiştî bikin!**

Niha dîmenên kolanên Colemêrgê ji yên Beyrûd û Gazzeyê jî xerabtir bûne. Dewletê, tenê tiştek maye ku nekiriye. Ew jî ew e ku balafirên dewletê bi hinceta gerîla di bajar de bi cih bûne, bajarî gulebaran bikin.

## Enver encax hefteyekê li ber xwe da

COLEMÊRG - Enver Turan jî jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Enver Turan pêr êvarê li Colemêrgê bi beşdariya deh hezaran kesî ve hate definkirin. Turan roja cejnê ji aliyê çawişekî pispor ve hatibû birîndarkirin û piştî 7 rojan di komayê de ma jiyana xwe ji dest da. Gelê Colemêrgê Enver wekî şehîd îlan kir û bi slogana 'şehîd namirin' defin kir.

Li Colemêrgê roja yekemîn a Cejna Remezanê ji ber qetilkirina 9 gerîlayan xwepêşandanek pêk hat. Gel li hemberî qetilkirina gerîlayên ku ji ber biryara bêçalakîtiyê xwe vekişandibû kozikên xwe û şer nedikir, nerazîbûna xwe anî ziman û li gerîlayan xwedî derket. Di encama êrîşa polîsan a li hemberî gel de li bajar pevçûn qewimîn û di nava demeke kin de bûyer li tevahiya bajar belav bûn.

Çawişekî pispor li taxa Biçerê ji wesayîta xwe ya sivîl peya bû û Enver Turan hedef girt. Enverê 15 salî bi guleya bi serî ketî birîndar bû. Piştî rakirin Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Wanê 7 rojan di komayê de ma. Pêr berê sibê Enver li hemberî mirinê zêdetir nekarî li ber kxwe bide û jiyana xwe ji dest da.

Heman rojê cenazeyê Enver ji Wanê hate girtin û li Colemêrgê hate definkirin. Cenazeyê Enver ê ku ewilê birin taxa Biçerê, ji vir jî birin Goristana Serê Sola ya li taxa Kanîkewkê û hate definkirin. Bi deh hezaran colemêrgiyên beşdarî merasîma cenazeyê Enver bûyîn, ew wekî şehîd îlan kir û slogana 'şehîd namirin' berz kir.

Bavê Enver Turan, Mehmet Turan dilxweşiya xwe ya ji bo beşdarên merasîma cenazeyê anî zimin û derbirî ku dewletê kurê wî qetilkiriye. Girseya li goristanê civiyabû pêk ve konê taziyeyê yê ji bo Enver li taxa Biçerê hatiye vedan ziyaret kir.

## 4 kes li Pirsûsê hatin binçavkirin

RIHA - Binçavkirinên li Kurdistanê bi dawî nabin. Herî dawî li Elîgora Pirsûsê 4 kes hatin binçavkirin.

Yekîneyên cendermeyan li bajaroka Elîgorê ya navçeya Pirsûsê û gundên girêdayî navçeya Pirsûsê ya Rihayê bi ser gelek malan de girtin û 4 kes binçav kirin. Li Elîgorê Medenî Kiliç û kesekî navê wî nehat zanîn, li gundên Karadutê û Hesemiyê jî Abdulvahît Gunhan û Mehmet Uçkan hatin binçavkirin. 4 kesên sedema binçavkirina wan nehat zanîn birin Midûriyeta Polîsan a Pirsûsê.

## Li Semsûrê binpêkirina mafan û pêkutiyên keyfî

ENQERE / DÎHA- Girtî û hikumxwarên di Girtîgeha Tîpa E ya Semsûrê de dimînin diyar kir ku piştî rêveberiya girtîgehê hate guhertin pergala kamera û Projeya Dada Neteweyî dest pê kir û bi vê pergalê re gelek maf tên binpêkirin. Girtiyan, anî ziman piştî vê yekê cezayên dîsiplînê û nêzîkahiya li dijî malbatan hate guhertin û ji ber greva birçîbûnê ya 2 rojan 56 kes mehek cezayê dîsiplînê girtine. 20 girtiyên ku di daxwaznameyên xwe de ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan "birêz" bi kar anîne cezayê hucereyê girtin.

20 girtiyên ku di daxwaznameyên xwe de ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan "birêz" bikar anîne cezayê hûcereyê girtin. Girtiyan, da zanîn ku rêveberiya girtîgehê tahamûlê nîşanî peyva "birêz" jî nade û ev yekê wekî propagandeya rêxistinê nirxand. Girtiyan, destnîşan kir ku nameyên girtî û daxwazname propaganada nîn in Dadgeha Bilind û dozgeriyan biryara pêşopandinê dan lê rêveberiyan girtîgehê cezayan dide û Dadgeriya Înfazê jî van cezayan erê dike.

Girtiyan, anî ziman ku di mijara tedurìstiyê de pirsgirêka doktor dijîn û hefteyê carekê kontrola rûbarî dikin. Girtiyan da zanîn ku gelek caran cihê karmendê tendûristiyê gardiyan tê peywirdarkirin û ev yek jî dibe sedema nexweşiyên mayinde. Rewşa girtiyê bi navê Îsmet Ayaz minak hate nişandan. Ayazê ji ber qirika wî di êşa çû nexweşxaneyê, lê jê re gotin ev yek bangora nexweşiya çolyakê ye. Li ser israra Ayaz kontrolên hatin kirin derxist holê ku Ayaz bi nexweşiya pençeşêrê ya Betenê Tîroîd ketiye û ji bo dermankirinê jî dereng maye.

Her wiha di girtîgehê de 3 zarokên mexdûrên TMK'ê jî hene û li hemberî van zarokan pêkutiyên edliyan pêk tînin. Niva şevê êrîşan li wan dikin ku bi tirsînin û bi tepîsînin.

Malbatan jî diyar kir ku dema ku ev diçin ziyareta zarokên xwe rastî tacîzan tên û di serî de gardiyanên jin li dijî wan muameleya sûcdariyê li wan dikin hemû cil berdeyên wan dixwzin derxin û dema ku ev yek nahate qebulkirin jî ji ziyaretê tên menkirin. Malbatan, da zanîn ku ji bo vê yekê pişkokekî metal têra heye û ev yekê qebul nakin.

Rayedarên girtîgehê diyar kirin ku pergala kameraya UYAP'ê dest pêkiriye û 1'emîn Midûrê girtîgehê jî hatiye guhertin lê têkildarî îdiayên din de tu agahî nedan.

# Kujerên Apê Mûsa pirsîn




AMED - RIHA - ÊLIH - STENBOL

Di çalakiya ku ji aliyê ÎHD û lêzimên windayiyan ve her hefte roja şemiyê bi dirûşma 'Bila winda bên dîtin, faîl bên darizandin' pêk tê vê hefteyê ji bo Apê Mûsa pêk hat. Çalakî li Amed, Êlih û Rihayê hate lidarxistin.

Çalakiya li ber Abîdeya Mafê Jiyanê ya Parka Koşuyoluyê pêk hatî ket hefteya 84'an. Ligel rêveber û endamên ÎHD'a Amedê, Serokê BDP'a Amedê Nîjat Yaruk, Serokê MEYA-DER'ê Alî Ozgen, Serokê Egîtîm Sen'a Amedê Abdullah Karahan, Serokê DIAY-DER'ê Zahît Çîftkuran, endamên Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê û nûnerên sendîkayên bi ser KESK'ê ve tevli bûn. Di çalakiyê de wêneyên Apê Mûsa ku li ser 'Apê Mûsa nemire' nîvîsandî hatin hilgirtin.

Li Rihayê jî di hefteya 20'emîn de çalakiya ji bo windayan hate lidarxistin. Çalakiya li ber Kargeha Karakoyunê hatiye lidarxistin bi beşdariya Serokê Giştî yê Sendîkaya Teqawîtan Osman Ozdemîr, Serokê ÎHD'a Rihayê Cemal Babaoglu, Serokê BDP'a Rihayê Îbrahîm Ayhan û nûnerên sendîkayan pêk hat.

Li avahiyê ÎHD'a Êlihê jî di heman çarçoveyê de daxuyaniyek ji çapemeniyê re hate dayîn. Serokê ÎHD'a Êlihê Osman Kuntes û lêzimên windayan beşdarî daxuyaniyê bûn.

**Aqûbeta Gundem pirsîn**

Dayikên Şemiyê di hefteya 286'an bi pankarta "Kiryar diyar in winda li ku ne" û wêneyên kesên hatin windakirin li Qada Galatasarayê hatin cem hev. Dayîkê Şemiyê di çalakiya xwe ya vê hefteyê de aqubeta Îbrahîm Gundem ê ku di sala 26'ê îlona 1991'an de li gundê Sarierîkê yê Hezroya Amedê ji aliyê leşkeran ve hate binçavkirin û piştre jî tu agahî jê nehatin girtin pirsîn.

## Li Gevera Colemêrgê penaber dan ber guleyan

COLEMÊRG - Li Geverê polîsan bi ser malekê ku penaber tê de bûn de girt û gule li penaberan barandin. Hinceta polîsan ji qebeheta wan xerabtir bû.

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê bi hinceta ku endamên HPG'ê di malê de hene polîsan avêt ser malekê. Bi dehan polîsan bi ser malê de girt û penaberê di malê de di encama gulebaranê de birîndar bû.

Hate zanîn ku duh êvarî li Taxa Orman a Navçeya Geverê bi dehan polîsên girêdayî Midûriyeta Polîsan a Navçeyê bi îdiya ku gerîlayê HPG'ê hene avête ser malekê. Hate ragahandin ku di serdagirtinê de polîsan gule bera hewa dan û di encama guleberdanê de kesekî ku afganî ye bi 3 guleyan birîndar bû. Di serdagirtinê de 15 penaber hatin binçavkirin.

## Li Şemzînanê qezeya trafîkê

COLEMÊRG - Li navçeya Şemzînanê ya Colemêrgê, kamyona plakaya wê 30 YA 930 ku ajokariya wê Seyfî Fîdan (40) dikir û ji gundê Naberoja ber bi Şemzînan ve hat, ji ber vîraj derbas nekir qulipî. Ajotkar Fîdan li cihê qezayê jiyana xwe ji dest da.

# 'Tu serokwezîrê kurdan nîn î'

## Heyeta BDP'ê bi boneya bûyera gundê Peyanisê ku 9 welatiyan jiyana xwe ji dest dan, lêkolîn bikin çûn Colemêrgê. Kişanak diyar kir ku Erdogan serokwezîrê kurdan nîn e

**COLEMÊRG** - Hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak ligel endam û rêveberên partiyê heyetek ava kirin û çûn gundê Peyanisê ziyaret kirin. Heyeta BDP'ê sersaxî ji malbatên 9 kesên di teqînê de jiyana xwe ji dest dan xwest. Di ziyaretê de Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, diyar kir ku li cihekî wisa ji bilî hêzên dewletê tu kes çalakiyê li wir pêk nayne. Kişanak, anî ziman ku Erdogan ne Serokwezîrê gelê kurd e.

Bertekên kurdan a li dijî qetlîama Colemêrgê zêde dibin û ev bûyer li Colêmerg, Şemzînan û gelek bajaran hat şermezarkirin. Heyeta ku ji Hevserokên BDP'ê Demîrtaş û Kişanak, Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk, parlementerên BDP'ê Ayla Akat Ata û Bengî Yildiz, Sebahat Tuncel, Hamît Geylanî, Şaredarê Colemêrgê Fadil Bedirhanoglu û gelek rêveberên BDP'ê pêk dihat li taxa Gaziya Colemêrgê kone sersaxiyê yê ji bo Eşref Gur ziyaret kir. Li vir Hevserokê BDP'ê Demîrtaş, ji malbatê sersaxî xwest û anî ziman ku wan heta niha tu carî komkujî qebûl nekirine û dê ji niha û şûnde jî qebûl nekin. Demîrtaş, bang li rayedaran kir û xwest bên li herêmê li welatiyan guhdar bikin û li gorî rastiyan tev bigerin. .



Heyet piştre çû konê sersaxiyê yê ji bo Şîrîn Kurt hatibû vekirin ziyaret kir. Kişanak, destnîşan kir ku Serokwezîr û Serokomar bêyî rastiyê zanibin û lêkolîn bikin li cihê xwe dozgeriyê dikin û gel tawanbar dikin. Kişanak, anî ziman ku berbirsiyar dewlet e û xwest rastî bê zelalkirin. Kişanak wiha got: "Her kes behsa veqetîneke hestiyarî dike. Ger ku hun bi vî awayî tevbigerin, ne veqetîna hestiyarî, dê tu eleqeya me bi we re nemîne. Ev veqetîn bi destê we hatiye kirin. Dê hêj bi hêztir be. Sedema vê veqetînê hûn in. Cihê çalakiya ku pêk hatiye cihekî vala ye. Tu kesê ku parastina wî tune be nekare li vir çalakiyê pêk bîne. Tu kesê ku garantiya xwe negire nikare di nava rojê de biçe cihekî vala û çalakiyê pêk bîne. Wateya bi hezaran muhîmatên ku li wirin karê yekineyên we yên kontra yên ku bi salan in li wir digerine. Di vê bûyerê de evqas pirsên ku hene, serokwezîr derdikeve partî û gelê me sûcdar dike. Serokwezîrê ku bersiva van pirsên me nede ne serokwezîrê Colemêrgê ye. Em jî ji wî serokwezîrî re wisa dibêjin;Tu êdî ne serokwezîrê Colemêrgê ye, tu ne serokwezîrê kurdan î."

**'Sersaxî jî nexwest'**

Kişanak anî ziman ku piştî axaftinan serokwezîr bi rojan in ji colemêrgiyan sersaxî nexwest û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Helwesta hikûmet û serokomara ev e ku vî gelê terkê êş û derdê wan bikin û li ser êşa wan siyasetê bikin. Ger ku bi qasî zereyê dilê wan biêşiya dê sersaxiyek ji gel bixwestana. Dê ev gel guhdarî bikiran û fêm bikirana. Li ser daxwaz gel dikaribûn lêkolînek bikirana. Bûyerê bê ku lêpirsîn bikin, wekî ku her tiştî dizane serokwezîr radibe û diaxive. Wê demê mafê me jî heye ku em jî bibêjin, gelo we ev plankiriye."

Heyetê piştre çû li Mezraya Jêr û li vir konê serxasiyê ku ji bo Raîfe Çîftçî û Nurullah Çîftçî hatibû vedan ziyaret kirin. Piştre heyet derbasî şaredariyê bûn û bi endamên Platforma Demokrasiyê ya Colemêrgê re hevdîtinek pêk anîn.

## Delîl 'zarokên baş' nîşan didin

**ENQERE / DÎHA** - Nûnerên partiyên siyasî têkildarî komkujiya gundê Peyanisê ya 9 kesî jiyana xwe ji dest da, diyar kirin ku kesên nexwazin pirsgirêka kurd çareser bibe ev komkujî pêk anîne. Nûnerên partiyan anîn ziman ku li gorî delîlên derketin holê JÎTEM û "zarokên baş" ên bi sedan komkujî û bi hezaran "bûyerên kiryar nediyar" pêk anîn nîşan dide.

Serokê Giştî yê EDP'ê Ziya Halîs, bûyera li Colemêrgê pêkhat û 9 welatiyan jiyana xwe ji dest da şermezar kir û xwest ku demildest kiryarên bûyerê bên dîtin. Halîs, diyar kir ku ev bûyer ji aliyên kesên aştiyê nexwazin ve hate kirin û ji aliyê hêzîn ku nexwazin pirsgirêka kurd bi aweyekî aştiyane çerser bibe hate kirin. Halîs, da zanîn ku divê pirsgirêka kurd bi awayekî aştiyane di demekî kin de bê çareser kirin. Halîs, destnîşan kir ku nêzîkahiya Serokwezîr Recep Tayîp Erdogan a ku bûyer ji aliyê rêxistinê ve hate kirin daxuyaniyekî lezgîn e û wiha axivî: "Navnîşana Birêz Erdogan nîşan dide şînber nîn e. Ji ber vê yekê divê vê bûyerê zelal bike. Berê jî bûyera Basa ji aliyên hêzên tarî ve hatibûn kirin û navnîşan şaş nîşandabûn."

Alîkarê Serokê Giştî yê EMEP'ê Sabrî Topçu jî bi daxuyaniyekî nivîskî xwest ku kiryarên bûyerên bên dîtin û operasyon bên rawestandin. Topçu, bal kişand ser girîngiya diyalog û agirbesteke mayînde û wiha got: "Em komkujiyê lanet dikin, sersaxiyê li malbatan re dixwazin. Ji bo kesên birîndar jî şifayê dixwazim." Topçû, diyar kir ku ev bûyer weke bûyera di sala 1996'an a li navçeya Basaya Şirnexê ya ku 11 gundî di minîbûsê de hatin qetilkirin e. Topçû, da zanîn ku delîlên derketin holê JÎTEM û "zarokên baş" nîşan dide û wiha axivî: "Serokwezîr, berdevkê hikûmetê û Serokomar daxuyaniyên provokatîf didin û gelê kurd û BDP'ê sûcdar dikin. Herêma Colemêrgê wekî ûs diyar kirine û komkujiyan lê dikin."

**Ev Şemzînana duyemîn e**

Alîkara Serokê Giştî yê SDP'ê Barişta Erdost, diyar kir ku agirbesta PKK'ê îlan kir dewlet di nav xetimandinekî cidî de hişt û wiha got: "Li aliyekî operasyonan li dar dixin, li aliyekî jî li Colemêrgê provokasyonan plan dikin. Ev yek hemû polîtîkayên înkarê ne." Erdost, anî ziman ku kengî hikûmet bi nûnerên gelê kurd re hevdîtinan bike provokasyonên wisa pêk tên. Erdost, da zanîn ku komkujiya li Colemêrgê pêk hat perçeyekî operasyonên li herêmê tên darxistin e û wiha pê de çû: "Heke niyeta hikûmetê ya gav avêtin hebe, divê dest ji tûnekirina tevgera kurdan berde. Bûyera Colemêrgê 2'yemîn bûyera Şemzînanê ye. Karê 'zarokên baş e'"

**SP: Ev komkujî sabotaj e**

Alîkarê Serokê Giştî yê Partiya Sosyalîst Mustafa Kahya jî, diyar kir ku ev komkujiye ji bo ku pêvajoyê sabotaj bikin hate kirin û wiha got: "Ev çalakî PKK'ê nekiriye. Delîlên li qada bûyerê hatin dîtin ev yekê zelal kir. Cihê ku van rastiyan binirxînin PKK'ê sûcdar dikin."

## 'Em ne navbeynkar in lê em dişopînin'

**STENBOL** - Serokê "Komîsyona Aqilmendan" û Serokomarê Fînlandiyayê yê berê û Xelatgirê Nobela Aştiyê Marttî Ahtîsaarî, gera xwe ya li Amed û Stenbolê pêk anîn bi daxuyaniyekê ji raya giştî re parve kirin. Ahtîsaarî, diyar kir ku heyet ji bo ku di navbera dewlet û kurdan de navbeynkariyê bike nehatiye Tirkiyeyê û wiha got: "Nêzî 40 nîjadên cuda li Tirkiyeyê hene û divê pirsgirêkên xwe bi serê xwe çareser bikin. Ev pirsgirêkên di navbera her civakê de tên rojevê û mijarên çareseriyê ne. Ev mijar bi nîqaşan divê çareser bibin."

Heyeta ku Ahtîaarî serokatî dikir, têkildarî hevdîtinên kirin de li Otela Swissê civîna çapemeniyê li dar xist. Serokê heyetê Ahtîsaarî ku di cîvînê de bi gotina "Wekî komîsyonê di hevdîtinên me yên li Amedê de, daxwazeke me ya wekî navbenkariya pirsgiraka kurd bikin nebû" dest bi axaftinê kir, da zanîn ku ji bo hînbûna tiştên nû li vir in wiha got: "Li derveyî vê yekê daxwazek me ya cuda nîn e." Ahtîsaarî, destnîşan kir ku agahî û çavderiyên di van hevdîtinan de girtine ji bo amadekariya rapora 3'yemîn a Tirkiyeyê ye. Piştre di beşa pirs û bersivan de, piştî der barê polîtîka û reformên Tirkiyeyê de di pêvajoya Ewropayê de nirxandineke kin hate kirin, bi giştî ji ber pênaseya "navbeynkar" di civînê de pirsgirêka kurd hate nîqaşkirin.

Ahtîsaarî, destnîşan kir ku ji ber tecrûbêyên wî yên berê pênaseya navbeynkar lê dikin û nêrîna xwe ya kesane ya der barê pirsgirêka kurd de jî wiha vegot: "Li welatekî wekî Tirkiyeyê ku nêzî 40 nijadên cuda hene, lazim e pirsgirêkên xwe bi xwe çaser bike. Lazim e ev pirsgirêk di nava hemû civakan de bikevin rojevê û bên çareserkirin. Neçar in nîqaş bikin û çareser jî bikin." Ahtîsaarî, ji diyaloga di navbera Endonezya û gerîlayên AÇE'yê jî mînak dan û diyar kir ku li gelek herêmên cîhanê di nava civînên zimanê wan tûj de maye. Ahtîsaarî, anî ziman ku ne wekî heyet, lê wekî kes di rojên li pêş de dê bê Tirkiyeyê. Ahtîsaarî, di dawiya axaftina xwe de ji rojnamegeran têkildarî azadiya çapameniyê ya li Tirkiyeyê agahî girt.

**'Mafê kurdan ê ziman heye'**

Musteşarê Wezareta Karên Derve ya Awûstûryayê yê Berê Albert Rohan, diyar kir ku dema berê dihatin nasnameyên tirk û kurdan tabû bûn û îro asta qebûlkirinan wan a hev girîng dibînin û wiha got: "Li cem van jî hin daxwazên ji bo der barê nasandina kurdan de hene. Ji bo wan bikaranîna ziman û nasnameya xwe girîng e. Ji bo di çapamenî û perwerdehiyê de zimanê xwe bi kar bînin, divê daxwazên kurdan li ber çavan bên girtin. "

**'Îspanyayê xweserî hilbijart'**

Wezîrê Karên Dervê yê berê û Endamê Parlementoya Ewropayê yê berê Marcelîno Oreja Aguîrre jî diyar kir ku dema ew wekî baskiyekî li daxwaza gelê kurd a xweseriyê dinêre ji bo wî pir biyanî nayê û wiha dom kir: "Li vir 2 tiştên girîng ên divên bên qebûlkirin hene. Ya yekemîn terorîzm bi tu awayî nayê qebûlkirin. Ya din jî, lazim e mafên wekî perwerdehî û ziman bên qebûlkirin. Lazim e rêveberiyên herêmî xwe organîze bikin. Me li Îspanyayê xweserî hilbijart û wekî 17 herêmên otonom cuda bûn.



## Bi sedan kesan muzakere xwest

**ENQERE/ DÎHA** - Ji hêla Meclisa Aştiyê ya Enqereyê ve meşek hate lidarxistin. 178 endam û rêveberên saziyan tevli meşê bûn, xwestin ku muzakere bê destpêkirin û bersivek bidin bêçalikîtiya PKK'ê. Berdevkê Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê Metîn Bakkalci, destnîşan kir ku heke hikûmet gavek neavêje pêkanînên ku piştî 20 îlonê pêk bê berpirsiyar e.

Bi sedan kes li Enqerê bi minasebeda îlankirina bêçalaktiya PKK'ê meşek li dar xist û gotin ku divê li hemberî biryara bêçalaktiya PKK'ê bersivek bê dayîn û ji ber ku rojek maye. Girse li Qada Kolejê civiyan û pankarta 'Bila operasyon raweste û muzakere dest pê bike'. Serokê giştî ya KESK'ê Samî Evren, serokê giştî ya TTB Erîş Bîlaloglu, serokê giştî ya ODP'ê Alper Taş, parlamenterê Rihayê ya BDP'ê Îbrahîm Bînîcî, serokê giştî ya ÎHD'ê Ozturk Turkdogan, rêveber û endamên EMEP, SDP, SP, Halkevlerî, 78'an û rêveberên partiyan tevli meşê bûn. Ji ber ku rê ji trafîkê re hate girtin alozî derket. Li hemberî polîsan dîsa meş dom kir û her wiha welatiyên derdor jî piştgirî da meşê. Meş li cadeya Sakaryayê bi dawî bû.

Bakalci, di axaftina xwe de bal kişand ser biryara bêçalaktiya PKK'ê û diyar kir ku rojek ma ku biryara bêçalaktiya PKK'ê xilas bibe. Bakalci, da zanîn ku divê demildest gavek bê avetîn û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Divê pirsgirêkên xwe bi werêktî çareser bikin. Demildest riyên diyalogên bên vekirin. Piştî biryara PKK'ê heya niha 18 HPG'yî, 2 leşker û bi dehan sivîl jiyana xwe ji dest dan. Operasyona ku pêşiya cejnê li hemberî HPG'ê pêk hatî û herî dawiyê jî qetlîama li hemberî sivîlan mirovan dixe nav fikaran. Ligel van tiştan hêj jî şanseke ji bo aştiyê heye. Divê muzakere û diyolog pêk bê."

## Fermandarê JÎTEM'ê êdî di girtîgeha sivîl de ye

**AMED** - Fermandarê Cendermeyan ê Kayseriyê Serheng Cemal Temîzoz ê ku ligel Şaredarê Cizîrê yê berê Kamîl Atag û kesên bi navê Tamer Atag, Firat Altin (Abdulhakîm Guven), Hidir Altug, Adem Yakîn û Kukel Atag re li 6'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê tên darizandin duh piştî rûniştina 18'an ji girtîgeha leşkerî sewqî girtîgeha sivîl hate kirin. Temîzoz, piştî 18 mehan sewqî Girtîgeha Tîpa D a Amedê hate kirin.

Dozgeriya Leşkerî ya 7'emîn Fermandariya Leşkerî ya Kolorduyê ya Amedê ji dadgehê re nivîs şand û diyar kir ku tu têkilîya Temîzoz bi leşkeriyê re nemaye û di nivîsa ji dadgehê re hate şandin wiha gotin." Fermandariya 7'emîn Kolorduyê ya Amedê ji Dozgeriya Leşkerî re nivîsa têkildarî Cemal Temîzoz şand û diyar kir ku ji 30'ê tebaxa 2010'an û şûn de li gorî hejmara 1632 Zagona Cezayê Leşkerî ya xala 39'an têkiliya wan bi hevre nemaye û xwest di 17'ê Îlona 2010'an de vê biryarê tev li dosyayê bikin. Li ser vê daxwazê ev biryar tevli dosyaya Temîzoz kirin.

Serheng Temîzoz, ê ku di 25'ê adara 2009'an de li Amedê hate girtin û ev 18 meh in di 7'emîn Girtîgeha Leşkerî ya Fermandariya Kolorduyê ya Amedê de dima. Di îdianameya Serdozgeriya Komarê ya Amedê ya ji 104 rûpelan pêk tê hate amadekirin û di derbarê Temîzoz de 9 caran cezayê giran ê heta heta tê xwestin

www.arsivakurd.org

## Îran: Divê DYA girtiyên îranî serbest berde

**TEHRAN** - Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad xwest di berdêla serbestberdana Sarah Shourd a amerîkî de Amerîka jî hemû girtiyên Îranî yên li Amerîka û li cihên din digire serbest berde. Ehmedînejad li ser mijarê daxuyanî da televîzyona dewletê ya Îranê. Di daxuyaniyê de vegot ku di berdêla serbestberdana "Sarah Shourdê" tu hêviya wan nîn e, ancax bi awayê xwezahî û exlaqî divê hin tişt bên kirin. Wek mînak em li bendêne ku hikûmeta Amerîkayê jestek bike li Tayland, Gurcistan û hin deverên din îraniyên ku bazirganiyê kirine û ji aliyê Amerîkayê ve hatine girtin serbest bên berdan.

Di destê Îranê de 3 amerîkî girtî bûn û ji vana Sarap Shourdê roja sêşema borî di berdêla 500 hezar dolarî serbest hate berdan. Sarap Shourd ev saleke di destê Îranê de girtîbû, piştî serbest hatibû berdan li Muskatê radestî sefaretxaneya Amerîkayê hatibû kirin. Shane Bauer û Josh Fattal hê li Îranê girtîne û di tîrmeha 2009'an de ligel Shourdê di nav sînorê Îranê de hatibû girtin. Her sê jî bi sûcê ku bi riyên ne qanûnî ketine nav sînorê Îranê û xwestine di nav Îranê de casusiyê bikin tên darizandin.

## Molotof avêtin Sefaretxaneya Tirkiyeyê

**ATÎNA** - Li bajarê Selanîka Yewnanistanê molotof avêtin sefaretxaneya Tirkiyeyê. Ji ber molotofê noqteya polîsan a li ber sefaretxaneyê agir pêket û şewitî. Di şewatê de bê ku kes zirar bibîne xesara madî derket holê. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin piştî nîvê şevê li bajarê Selanîka Yewnanistanê molotof avêtine noqteya polîsên parazvaniya sefaretê dikin. Molotof li noqteya polîs lê dimînin dikev agir bi klûbeyê dikeve û xesara madî dide qulubeyê. Şewat piştî demek ji aliyê yekîneyên agirkuj ve tê vemirandin. Polîs bi daxuyaniyek got ku wan li ser bûyerê dest bi lêpirsînê kirine.

# YE ceza li Sarkozy dibire

Sarkozy gotibû Merkel jî piştgiriya polîtîka wî dike. Ancax Almanyayê vê daxwazê red kir û YE'ê jî ji ber polîtîkaya nijadperest dê cezayê dîsiplînê bide Fransayê û ji sedî 71'ê fransiyan dibêjin van polîtîkayan îmaja fransayê li hemberî raya giştiya navneteweyî xirab kiriye



**BRUKSEL** - Serokomarê Fransayê Nîkolas Sarkozy diyar kiribû ku Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel jî wekî wî difikire û gotiye dê Almanya jî kampên romenan yên li Almanyayê rake û romenan dersînor bike. Di encama anketek de derket holê ku ji sedî 71'ê fransiyan ji ber polîtîkayên nijadperest ên hikûmetê îmaja Fransayê ya navneteweyî xirab bûye aciz in. Pêr jî di civîna YE'yê ya bilind a li Brukselê, li ser polîtîkayên nijadperest û dersînorkirina romenan a ji Fransayê di nav Serokê Komîsyona YE'yê û Sarkozy de jî alozî derket û beziyan hev.

Hikûmeta Berlînê li ser vê bertek nîşan da îdiayê red kir û hat diyarkirin ku axaftinên Merkelê yên li ser romenan xelet hatine fêmkirin.

Sarkozy gotibû: "Merkelê ji wî re gotiye dê Almanya jî wekî Fransayê kampê romenan rake." Wezîrê Karên Derve yê Almanyayê Guido Westerwelle got ku Sarkozy gotinên Merkelê xelet fam kiriye.

Rojnameya Sud Ouest Dimancheyê lêkolîna saziya Ifop a anketê weşand. Di lêkolînê de derketiye holê ku ji sedî 71'ê fransiyan di wê baweriyê de ne ku polîtîkayên hikûmeta Sarkozy ya nijadperest kû neyartiya biyaniyan dike îmaja Fransayê xira kiriye. YE'yê jî ji ber helwesta nijadperest a Sarkozy bertek nîşan da û aşkera kir ku dê li dijî Fransayê cezayê dîsiplînê bê bikaranîn.

Berpirsiyarê Karên Hiqûqî yê YE'yê Vivianne Reding destnîşan kir ku dersînorkirina romenan 'şerma mezin' e û vegot ku pêkan e ku bi vê polîtîka dersînorkirina romenan qanûnên YE'yê jî hatine binpêkirin. Pêr jî aloziyeke mezin di dicivîna YE'yê ya li Brukselê derket. Di nav hevparên YE'yê de tengezarî derket, di atmosfereke mezin de alî beziyan hev. Serokê Komîsyona YE'ê Jose Manuel Durao Barroso polîtîkayên Sarkozy wekî polîtîkayên nijadperest destîşan kiribû û gotibû dibe ku Sarkozy bi van polîtîkayên xwe qanûnên YE'yê bin pê kiribe. Barroso diyar kiribû ku ew dê hiqûqa YE'yê biparêzên. Heke qanûn hatibin binpêkirin dê cezayê dîsiplînê bidin hikûmeta Parîsê.

Nîcolas Sarkozy bi îdiaya di bin sedemê pirsgirêkên asayîşê bi qasî hezar romenî meha borî ji Fransayê dersînor kiribûn.

# Li Swêdê rastgir xurt dibin

**STOCKHOLM / ANF** - Swêd serdemek bi modela xwe ya 'demokrasiya civakî' ji bo cîhanê wek model dihat pêşkêşkirin û îro li vê welatî hilbijartin pêk tê. Balkêş e ku anketên di dema herî dawî de hatine kirin aşkera dikin ku meyla Swêdê ji ser ' demokratên civakî' vegeriyaye bi ser rastgirên nijadperest. Di anketên hatî kirin de tê gotin ku hikûmeta rastgir a desthilatdar ku ev çar sal in hikûmete dê di vê hilbijartinê de jî bi ser bikeve. Anket vedibêjin ku daneyên di destê wan de ne didin diyarkirin ku dê di hilbijartinê de Partiya Demokrat a dijberê biyaniyan jî bikeve parlamentoyê.

Swêd bi 'bi dewleta demokrasiya civakî' dihat nasîn ancax ev bû çar sal in partiyên neo-lîberal wisa kirin ku hew Swêd tê nasîn. Nîv milyon endamên sendîkayan ji sendîkayan veqetiyan. Xizmetên tenduristiyê û perwerdehiyê dewrê şîrketan kirine. Ev şîrketên kapîtalîst jî armanca wan ev e ku di dema kin de zêde kar bikin û dewlemend bibin.

Pergala eczaneya ku di cîhanê de pirtir bi ser û ber bû jî firotin û dan tekelan. Riyên trenê, xetên metroyê jî ketin destê şîrketên tayebet. Heke îro li Swêdê rastgirî bi ser bikeve yekemîn care ku li Swêdê dê hişmendiya rastgirî ya du serdem li du hev dibe desthilatdar. Heke daneyên anketan rast derkeve yekemîn car dê li Swêdê partiyeke dijberê biyaniyan û îslamiyetê dê bikeve parlamentoya Swêdê. Di sala 2006'an de rêjeya bêkarên swêdî ji sedî 6.5 bû. Ancax ev rêje îro derketiya heta 8.5'an. Ligel baçalên ne diyar ev rêje dertê heta ji sedî 17'an. Di hilbijartinan de partiyên çepgir di pêşengiya Sosyal Demokratan de enî avakirine û bi vê eniya hilbijartinê îro ketin hilbijartinê. Ji van aliyê xwe ve di dîroka Swêdê de ev dibe yekemîn hilbijartin ku xwedî van taybetmendiyan e.

Seroka Jin ya Sosyal Demokratan Mona Sahlîn ji bo dilê dengdêrnên rastgir xweş bike di rotaya polîtîka partiya xwe de tu guherîn pêk neanî, bi helwesta partiyê ya sosyal demokrat riya xwe didomîne. Ancax hilbijartina îro li gorî pisporan şansa serkeftinê nade çepgiran.

# Li Afganistanê ceribandina 3'yemîn

**QABÎL** - Piştî sala 2002'yan li Afganistanê rejîma Talîbanê hat daxistin heta niha 2 hilbijartinên bi giştî pêk hatin. Encax bi vekirina sindoqan re îdiayên pêkhatina nelirêtiyan jî dest pê kir û di êrîşa bi roket de jî 2 kes hatin kuştin.

Di vê hilbijartinê de 10 milyon û nîv afganî divê biçûna ser sindoqan. Di hilbijartinê de 2 hezar û 500 berendam hene û ji vana 249 berendam dibin parlamenter. 68 kursî ji jinan re ye.

Berya hilbijartinê Talîbanê banga boykotê kir û got: "Kesê çi berendam, çi muşahîdên sindoqan û çi jî dengdêrên banga boykotê negirin ber çav û biçin ser sindoqan ji tişta ku bê serê wan ew berpirs in."

Serokdewletê Afganistanê Hamît Qarzayî ku ji nelirêtiyê berpirs tê girtin û xwedî piştgiriya hêzên navneteweyî ye di vê hilbijartinê de ji rêjeya kêm a beşdaran û ji hîleyan bi fikar e. Di hilbijartina serokdewletiyê de ligel angaştê pir zêde yên nelirêtiyê jî Qarzaî careke din kirin serokdewlet. Civaka navneteweyî jî hemû angaştên nelirêtiyê yên ji bo Qarzaî danîn hêlek û piştgiriya didan Qarzaî xurtir kirin.

Berya ku hilbijartin biqede Berpirsê NY'ê yê taybet ê Afganistanê Staffan de Mîstura hêviyên xwe wiha anî ziman: "Hêvîdarim ev roj nebe rojeke xirab." Hilbijartina Afganistanê de 400 hezar polîsê afganî û leşkerên biyanî di peywira ewlehiyê de dixebitin. Nûnerê NY'ê diyar kir ku pergal hatiye başkirin û herkes vê qebûl jî dike, lêbelê mijara hîle û ewlehiyê di vê hilbijartinê de jî du problemên esasîne.

Li eyaleta Khostê ya başûrê Afganistanê di dibistaneke ku ji bo cihê hilbijartinê bikar dihat de teqîn pêk hat. Di ve teqînê de 2 jê çavdêrên afganî bi giştî 3 kes birîndar bûn. Li eyaleta Nangarhara li rojhilatê Afganistanê jî roketek li malek ket û di teqîna roketê de ji malê 2 kes hatin kuştin. Rojek berya hilbijartinê jî talîbaniyan 10 kesên ku piştgiriya berendamekî dikir û 8 peywirdarên komîsyonê bi giştî 18 kes revandin. Li rojhilatê Qabîlê jî berendamek ji aliyê talîbaniyan ve hatibû revandin. Li Qandeherê ku wek navenda talîbaniyan tê zanîn jî duh sindoqên dangdanê hatin danîn ancax rêjeya beşdaran pir kêm bû. Encama hilbijartina duh pêk hat dê di nav çend rojan de aşkera bibe.



## Di dibistaneke Belçîkayê de cihêkarî

**BRUKSEL / ANF** - Li Belçîkayê ferqa cihêkariyê xwe di nav pergala perwerdehiyê de jî li rû xist. Di koleja Onze-Lîeve-Vrouwê ya li bajarê Lokerenê zarok li gorî rayekên wan di polên cihê de hatin bicihkirin.

Dibistana Onze-Lîeve-Vrouwê ji 17 polan pêk tê û zarokên vê dibistanê li gorî zimanê xwe yê zikmakî di polên cihê de hatin bicihkirin. Bûyer bû mijara hevpeyvîna televîzyona heremî ya OOST'ê. Li gorî hevpeyvînê armanca pêkanînê ew e ku pêşî li getobûnê bigirin ev pêk hatiye. Li gorî Navenda Têkoşîna li Dijî Nijadperestiyê ev pêkanîn cihêkarî ye.

Midûrê dibistanê jî diyar kir ku wan flamanan di du polan de bi cih kirine. Li gorî midûr ji xwe di her polek de 2-3 xwendekarên flaman cih digirt û ji bo pêşî li maxdûriyetê bigirin dawî li pêkanîna berê anîne.

Malbateke flamanî diyar kir ku zarokên wan dê çawan di dibistaneke tevlihev de dê flamanî hîn bibin û bi vê daxuyaniya xwe piştgiriya vê pêkanînê kir. Wezîrê Perwerdehiyê yê Flaman Pascal Met jî bang kir ku zarok ji rayekên xwe xweser li polan bên belavkirin.

Li gorî OOST TV'ê gelek malbat vê pêkanîna li gorî rayeka zarokan avakirina polên perwerdeyê pêkanîneke cihêkar qebûl dikin. Di koleja Onze-Lîeve-Vrouwê de rêjeya xwedekaran ji sedî 70'ê biyanîne. Malbatên herêmî ji ber vê zarokên xwe ji dibistanê derdixin. Midûrê dibistanê jî vedibêje ku wan xwest pêşî li vê bigirin da ku dibistan danegere 'getoyek' ji bo xwendekarên herêmî polên cihê avakirin.

Midûrê Perwerdehiya Seretayî yê koleja Onze-Lîeve-Vrouwcollegeyê diyar dike ku 17 pol hene, ji van polan tenê du pol ji bo zarokên herêmî cihê kirine û armanca wan ne ev e ku bi vê polê pergala "apartheîd" bi kar bînin. Pergala "apartheîd" li Afrîkaya Başûr di dema rejîma nijadperest a Aparthaîdê de bikar dihat û zarokên reşik ji zarokên çermspî dihat veqetandin û di polên cihê de dihatin perwerdekirin.


# SPASÎ

Li bejayiya Şemzînanê di 21'ê tebaxê de, dema bêçalikîtiyê de, di encama bombebaranek de Gulistan Ergul (Berîtan Sozdar) bi tevî sê hevalên xwe hatin şehîdkirin. Li ser navê malbata şehîdan ji bo tevlibûn û xwedî derketina gelê me yê bi rûmet em di serî de spasiyê xwe ji serok û rêvebir û şaredarên Colemerg ,Gever û Şemzînanê û bi tevahîyê gelê Colemergê re rê dikin û Serokê BDP'a Bedlîs, Tetwan, Xelat, Adilcewaz û bi taybetî gelê Hîzanê bi awayekî bi heybet li şehîdê xwe xwedî derketin, ji bo me bû moral û hêzek mezin. Di xwedî derketinê de rêxistina bajarê Edeneyê û gelê ku me tenê nehiştin em wekî malbata Şehîdan ji hemû gelê xwe yê hêja û bi rûmet spasiya xwe pêş keş dikin.

**Li ser navê malbata Şehîd Gulistan ERGUL (Bêrîtan Sozdar) Dayik û bavê wê Raîfe û Salih ERGUL**



## Ji jinên kurd gava duyem

Jinên kurd niha jî bi armanca 2'yemîn konferansa xwe li Hewlerê pêk bînin ketin nava amadekariyan. 21 endamên Lijneya Amadekariya Konferansê ku ji jinên kurd ên Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê pêk tên li Hotêla Jiyan a Dihokê gihiştin hev.

Lijneya amedekar dê 8 rojan li başûrê Kurdistanê bimîne û çalakiyê xwe bi gelek derdoran re berdewam bike. Jinan di carçoveya konferansê de civîna xwe ya yekem li Dihokê li dar xist. Civîn li Navenda Serwextkirinê ya Zanîngeha Dihokê pêk hat û dê 2 rojan bidome. Jinan di civînê de mijarên wekî "Ji bo aştiyeke mayînde rola jinê, şideta li hemberî jinê û her wiha di dawiya civînê de konferansa duyem bê nîqaşkirin.

Parlamentera berê ya DEP'ê Leyla Zana, parêzvana mafên mirovan Prz. Reyhan Yalçindag, keça parlamenterê DEP'ê Orhan Dogan Ayşe Dogan, endamên Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) Mulkiye Birtane, Gul Kiziltaş, Şaredara Derîkê Çaglar Demîrel, Parlamentera Wanê ya BDP'ê Fatma Kurtalan, Parlamentera berê ya Yekitiya Ewropayê Feleknas Uca, Keça Serokê Komara Kurd a Mahabatê Qazî Mihemmet Suheyla Qazî, Alîkara Partiya Demokrasiya Beşdar (KADEP) Yuksel Avşar û endama Navenda Rêvebirina (MYK) ya Partiya Edalet û Azadî (HAKPAR)'ê Hamiyet Çelebi, Jinên Herêma Kurdistanê Parlamenter Amîne Zikrî, Cigirê Serokê PÇDK'ê Necîbe Omer, ji Lîsta Goran Seyran xan û ji Partiya Komeleyê jî jinek di nav heyetê de cih digire.

# Amadekariya konferansa 2'yemîn dikin

Heyeta jinên kurd ên Tirkiyeyê di bin serokatiya parlamentera berê ya DEP'ê Leyla Zana de çûn Herêma Federal a Kurdistanê. Leya Zana li Dihokê diyar kir ku hewl didin konfransa duyemîn a jinên kurd li Hewlêrê pêk binîn

Serbaz SIYAMEND/ DIHOK - DÎHA

Rojên 24-25'ê nîsanê jinên kurd yên Tirkiye, Îran, Iraq û Suriyeyê li Amedê 1'emîn Konferansa Jinên Kurd pêk anîn. Amadekariyên konferansa 2'yemîn bi civîn û hevdîtinan didome. Heyeta jinên kurd ên Tirkiyeyê ku di bin serokatiya parlamentera berê ya DEP'ê Leyla Zana de ava bûbû, bi armanca civîna amadekariya ji bo konferansa jinan û konferansek neteweyî, gihîştin Herêma Federal a Kurdistanê. Li ser navê heyetê parlamentera berê ya DEP'ê Leyla Zana daxuyaniyek da çapemeniyê.

**Li Hewlêrê konferans**

Leyla Zana li Dihokê di civîna çapemeniyê de axivî û diyar ki ku wan di rojên 24-25'ê nîsanê de cara yekemîn li Amedê bi nasnameya xwe ya jinên kurd konferansek pêk anî û wiha got: "Konferans gelek serkeftî derbas bû. Gelek biryarên siyasî, olî, civakî, çandî, dîrokî û li ser pirsa jinê jî gelek biryar hatin girtin. Ya sereke li ser aştiyê biryar hatin girtin. Hem ji bo aştiya navxweyî û hem jî bo aştiya derdorê. Danûstandina nav meyî kurd, ev hemû biryarê konferansê bûn. Me wê demê jî biryar dabû ku em civîna 2'yemîn li Herêma Kurdistanê pêk bînin. Me xwestibû ku konferansa 2'yemîn li Hewlêrê bê amadekirin."

**'Hêviya civakê aştî ye'**

Zana, balkişand ser biryara agirbestê ya KCK'ê û wiha got: "Çek çiqas raweste ew qas aştî xurt dibe. Hêviya civakê jî hemî aştiyek mayînde ye. Gelê kurd her dem dixwazin bi rûmet wekî hemû gelê cîhanê bibin xwedî maf û hiqûq.

Dixwazin bi nasname û li ser xaka xwe bi azad bijî. Di vî warî jî de kar û xebatên me hene." Zana derbirî ji bo aştiyek mayînde jinê kurd çi ji destê wan hatibe kirine û dê dîsa ji bo wekhevî, demokrasî, edalet û aştiyê têbikoşin. Zana, bang li hemû jinên kurd kir û got: "Hêviya min ji jinên kurd heye ku di karê civakî de neteweyî bifikirin û di nava yekitiyê de bin."



## Biryarên girîng girtibûn!

1'emîn Konferansa Jinên Kurd a ku di nîsana borî de 2 roj li Amedê pêk hatî niha jî amadekariya konferansa 2'yem tê kirin. Di encamnameyê konferansa yekem de gelek biryarên hevpar ên girîng hatin girtin û têkoşîna hevpar a jinan derket pêş. Her wiha jinan bangawaziya têkoşîna jî bo neteweyeke demokratîk, welatekî demokratîk û perspektîfa makeqanûneke demokratîk kirin.

150 delege tevlî Konferansa Jinên Kurd a ku li Amedê pêk hatî bûn. Ji Tirkiyeyê, Îran, Sûriye, Iraq, Herêma Kurdistana Federal; siyasetmedar, akademîsyen, rojnamevan, nivîskar, hunermend û nûnerên saziyên sivîl û parêzvanên mafên mirovan jî di nav de yên li diasporayê dijîn tevlî konferansê bûn. Konferansa ku di 24-25 nîsanê de, li Amedê pêk hatî de bi sernavên wekî, "Pirsgrêkên kurdan ên siyasî û civakî, polîtîkayên dewletan ên li ser înkar û redkirina nasnameya kurdan, pirsgirekên ku jinên kurd pê re rû bi rû ne, şiklên cudahiyên piralî, perspektîf û rêbazên wan ên têkoşînê, parvekirina tecrubeyan, bidestxistina piştgiriya neteweyiya demokratîk de rêbazên jinan bi awayeke berfireh hatin nîqaşkirin."

**Biryarên girîng girtin**

Her wiha jinan di konferansê de ew tişt biryar girtin: "Bi tu awayî rê nedin şerê naxweyî û birakujiyê di nava kurdan de, li hemberî polîtîkayên red û înkarkirina çand û nasnameya kurdan û bi giştî jî li hemberî hemû çand, nasname û olên ku hebûna wan tên înkarkirin, tunehesibandin û bi her awayî bi cudaxwaziyê re rû bi rû dimînin re têkoşîna hevpar bide, li deverên ku asîmîlasyona li ser çand û kurdî didome, têkoşîneke hevpar esas digire, li ku dibe bila bibe, hemû cureyên tundiyê yên li dijî jinê, yên wekî berdêl, zewaca bi zorê, pirjinî, sunetkirina jinê, ferzkirina xwekuştinê, şideta zayendî, kuştinên li ser navê namûsê, şideta nav malê, recm, şideta dewletê, wekî sûcên mirovahiyê dihesibîne û li dijî vê têkoşîneke hevpar bimeşîne û nêrîna tekparêz civakî ya dewletê, ya ku rê li pirsgirêkên wekî siyasî, aborî û civakî vedike, ji bo çareseriya van, Xweseriya Demokratîk a Herêmî esas bigire."

Mizgîn Ronak



## Me li erdê nedîtiye

Di van rojên boykot û bêçalakîtiyê de divê tu kes xwe bi pey riyên tarî û tewş nexe û guhên xwe jî dengê dewletê û hevkarên wê yên bêbext re veneke. Lewre ya ku saniye bi saniye tê jiyîn û me tevlî axa Kurdistanê dike, dirok e.

Bi rastî hin kes û derdor timî aşiqê celadê xwe ne û dewlet û derewên wê yên bi tenî timî ji wan re şêrîn te, tu dibînî ku way şemitîne! Nêzîkatiya wan a li her tiştî çewt e, xwediyê şeytaniyek e. Lewre antênên wan timî ji dewletê re vekirîne.

Lê divê ku ev baş bê famkirin; em kurd xwe û tu tiştek xwe jî li erdê nedîtiye, her tişt bi nirx û şeref hatiye afirandin, bi can û xwîn, bi berxwedan û vîn. Lewre jî neynûkek zarokek kurdan, ji tevî tac û textan hêjatir e û em axînek dayikek xwe nadin bi dewlet û seltenetan. Her wiha biryara bêçalakitiya KCK'ê gelek hêja ye. Loma jî diviyabû ku dewlet bi dil û mêjiyek zelal û dirust nêzîkatî nişan bidaya. Lê xuyaye ku wate û hêjahiya wê nehatiye fêmkirin, loma ji bi awayekî sersar nêzîkbûn heye. Her wiha heman nêzîkatî li hember xweseriya demokratîk jî tê nişandan.

Gel û saziyên xwe bi coş û zanîn pêşwazî dikin û ji bo fêmkirinê hewl didin, lê hinekan xwe li ser guhên ker danîne, an jî gava neçar dimînin dikin mine min. Divê baş were zanîn ku gihîştina asta Xweseriya Demokratîk; serfiraziyek gelek mezin e û ew serfirazî, berî her tiştî, rê û dirbên li hember kes û derdorên ku berê wan li tarîtiyan e digire. Ango îro, êdî duh nîn e û kurdan rewş û performansa xwe ya îroyîn li erdê nedîtiye, dilop bi dilop afirandiye û di her dilopek de oqyanûsek hewandiye. Loma jî îro dikare xweseriya demokratîk li her tax û gund, her navçe û bajarê xwe ava bike û tevî mîkrob û vîrusên dewletî û hevkariyê tune bike.

Em dibînin; gelê Gevera şox û şeng, çawa dadgehên xwe yên civakî ava dike û tevlî qirêj û gemara ku bi destê dewletê hatiye çêkirin derbider dike. Li rûyên kurdan tîrêjên rojê diçirise.

Kurd bi serbilindî û zanînek wisa delal xemilîne ku êdî tang, qereqol û qişle jî, ji dewlet û hevkarên wê re nabin stare. Û ev pavajoya didome, dê bidome jî, heya ku zevî û binevş, hîv û stêrk, stran û saz, çivîk û asîman bigihîjin hev. Dê tu hêz nikaribe vê pêvajoyê bisekinîne.

Lewre kurdan tu gotin û gaveke xwe li erdê nedîtine. Her tişt hêja, her tişt xwedî wateyê ye. Loma jî divê ku her kes rêzdar û baldar tevbigere, xwe nefiroşe toza postalên leşkerên romê.

## DTP, femînîst û sosyalîzm sûc tê dîtin

STENBOL / DÎHA- Posteyên elektronîk ên Femînîst Hulya Osmanagaoglu ku di British International Schoolê wekî midûrê pirtûkxaneyê de dixebite ji aliyê rêveberiya dibistanê ve bêyî destûra wê hatin xwendin. Revebeyiyê tespît kir ku Osmanagaoglu di peyaman xwe de peyvên 'kurd' û 'femînîst' bi kar tîne û ji ber vê yekê ji ji kar hate avêtin. Osmanagaoglu têkoşîna xwe ya hiqûqî domand û doza vegera kar qezenc kir. Mamosteyê der barê rêveberiya dibistanê de jî doz vekir û ew doz didome.

Endama Kollektîfa Femînîstên Sosyalîst (SFK) Hulya Osmanagaoglu, di sala 2009'an de di British International School ê de wekî midûrê pirtûkxaneyê dixebitî ji aliyê rêveberiya dibistanê ve posteyên wê yên elektronîk bê destûr xwendin ve ji ber di nivîsên wê de peyvên 'DTP, pirsgirêka kurd, sosyalîzm û femînizm' derbas bûne, bi hinceta "bi peyamên xwe xebatên siyasî dike" ji kar hatibû avêtin. Osmanagaoglu, di doza hat vekirin de bi ser ket û biryar hate dayîn ku ew vegere ser karê xwe.

**Xwendina e-posteyan…**

Osmanagaoglu, diyar kir ku di gulana 2009'an de midûrê îngilîz Brian Smith xwestiye bê odeya wî û midûr gotiye; "Bi kompitûrên dibistanê tu çawa têkildarî nêrînên xwe yên siyasî e-posta dişînî? Tu dibistanê dixî xetereyê. Bi lez tu îstifa dikî. Bila ji bo te, ji bo me û ji bo polîsan jî pirsgirêk dernekeve." Osmanagaoglu, diyar kir ku li hemberî gotinên tehdîdkar ên midûrê dibistanê, pirsa 'tu çawa dikarî e-postayên min ê taybet bixwînî kiriye' û wê jî ji midûr re gotiye tiştên kirine sûc in.

Li ser minaqeşeyê Osmanagaoglu diyar kir ku wê ji midûr re wiha got: "Xwendina mailên min binpêkirina mafê min ê kesane ye. Pêkanînek derzagonî bebe ew jî ya we ye. Ez dê der barê we de gilî bikim." Osmanagaoglu, anî ziman ku endama SFK'ê ye û da zanîn ku di e-postayên ji bo wê hatine de hişyariya nîqaşên femînist û çalakiyên jinan hebûn e û wiha axivî: "Di nava wan bangan de têkildarî operayona 14'ê nîsana 2009'an a der barê DTP'ê pêk hatibû de agahî hebû.

## Dayika Munevver jî tevlî çalakiyê bû

STENBOL- Platforma li dijî qetilkirina jinan çalakiya xwe ya hefteyê li dar xist û dayika Munevver Karabulut Nagîhan Karabulut ji tevlî çalakiya jinan bû. Dayika Munevverê Nagîhan Karabulut di axaftina xwe de bal kişand ser qetilkirina jinan û got ku keça wê ne yekem e û ne jî ya dawiyê ye. Karabulut, destnîşan kir ku dewlet delîlan ji holê radike û dibe sedema serbest berdana kujeran. Platforma jinan 6'emîn çalakiya xwe ya meşê li dar xist û bal kişand ser qetilkirina jinan.

Jina pankarta 'Em ê qetilkirina jinan rawestinin' vekirin û her wiha wêneyên Munevver Karabulut, Guldunya Toren û Pipa Baccayê hilgirtin.

www.arsivakurdi.org

# Li Peyanisê pirsên bê bersiv...

**Teqîna li gundê Peyanisê yê Colemêrgê ku piştî referandûma 12'ê Îlonê û 4 roj beriya bêçalakîtiya KCK'ê bi dawî bibe pêk hat, her wiha piştî çalakiyê ligel gelek delîlên li pişt bûyerê mane xuya dike ku aydî leşkeriyê ne pirsên divê bên ronîkirin zêde dike**



**COLEMÊRG -** Teqîna di ronahiya rojê de li erdekî rast yê di navbera gundê Peyanisê û Silehê pêk hat û bû sedema kuştina 9 welatiyan li benda zelalbûna gelek pirsan e. Ligel delîl û çavdêriyên welatiyan dîsa rayedarên hikûmetê û çapemeniya tirk israr dike ku bûyerê têxe stûyê PKK'ê û ser bûyerê bigire.

Teqîna li gundê Peyanisê yê Colemêrgê ku piştî referandûma 12'ê Îlonê û 4 roj beriya bêçalakîtiya KCK'ê bi dawî bibe pêk hat, her wiha piştî çalakiyê ligel gelek delîlên li pişt bûyerê mane xuya dike ku aydî leşkeriyê ne pirsên divê bên ronîkirin zêde dike.

Teqîna ku têde 9 kesan jiyana xwe ji dest da û 4 kes jî birîndar bûn, gelek delîl û pirs li pey xwe hişt. Ligel delîl û şahidan dîsa hikûmeta AKP'ê û çapemeniya tirk hewl dide ku bûyerê têxe stûyê PKK'ê. Her çiqas bûyera Peyanisê dişibe bûyerên Basa, bûyera Şemzînanê ya Pirtûkxaneya Umutê jî dîsa hewldana ku ser bûyerê bigirin û tarî bikin ji ber çavan nareve. Balkêş e ku piştî referandûma 12'ê îlonê li gundê Peyanisê 970 hilbijêran 5 hilbijêr çûbûn ser sindoqan.

Li herêma ku hemû welatî piştgiriyê didin BDP'ê û dema piştî bûyerê konvoya BDP'ê derbas bû her kesî dirûşmeyên "Qatil Erdogan", "Şehît Namirin" û "Bijî Serok Apo" berz kirin. Leşkerên Qereqola Silehê ku ji bo operasyonê amade bûn, balkêş bû ku piştî bûyerê operasyon dest pê nekirin. Pirsên ku divê bên zelal kirin û li benda bersivê ne hin ji wan ev in:

✓ Qereqolên Peyanisê û Silehê 5 kîlometre dûrî cihê bûyerê ne. Agahiya qereqolan çawa û kengî ji bûyerê çêbû?

✓ Klûbeya cerdevanan ku 800 metreyî dûrî cihê bûyerê ye û bi awayekî zelal ewlehî wan tê xwestin çima wê rojê cerdevanan nobet nedigirt.

✓ Çima piştî buyerê operasyon pêk neanîn.

✓ Gelo heta niha kengî di nava tu çanteyên gerîlayên PKK'ê de, Dardanel Ton, Coca Cola û Bestenî (Dondurma) derketiye?

✓ Tiştên li cihê bûyerê hatine bidestxistin yên wekî Meteryalên MKE'yê, belgeyên Fermandariya Hêzên Bejayî (KKK) çanteya nivîsa "Xatireya Tugaya Komando ya Çiya yê Colemêrge" li ser hatibû nivîsin, gelo aydê PKK'ê ye?

✓ Leşkerên ku çûne cihê bûyerê, beriya her tiştî hewldane tiştên ku li cihê bûyerê hatine hiştin, biparêzên. Ev hewldan gelo dê çawa bê vegotin?

✓ Tê gotin ku fermandarekî di têlsizê de anonsa "Me li cihê bûyerê çanteyek hiştiye, wan ji wir bînin" derbaskiriye. Gelo, anonsek wiha hatiye derbaskirin?

✓ Çima leşkeran li cihê bûyerê operasyon nedaye destpêkirin?

✓ Kesên ku tê gotin endamên KCK'ê ne û telefonên wan hatine guhdarkirin, eger rast be çima heta niha nehatine girtin?

✓ Çima li gel ku dihate zanîn li ser rê mayin heye û leşkeran ji ber vê riya xwe guhertine, çima rê ji sivîlan re jî negirtine? Çima leşkeran li cihê bûyerê, xebata îmhakirina mayinê nedaye meşandin?

✓ Heta niha dema bûyerên wiha de rayedarên dewletê tevlî merasîmên cenazeyan dibûn. Gelo çima vê carê tevlî merasîma cenazeyên 9 welatiyan nebûn.

✓ Li gel ku dozger hêj hemû delîl venedabûn jî, Waliyê Colemêrgê Muamer Turker, bûyer di zûtirîn demê de xiste stûyê PKK'ê. Eger kiryarên bûyerê tên zanîn çima heta niha nehatine girtin?

✓ Rayedarên dewletê yên wekî Serokamar, Serokwezîr, Serfermandar û Wezîrê Karê Hundir ku bûyerê dikin stûyê PKK'ê çima heta niha neçûne Colemêrgê?.

✓ Şeva piştî bûyerê, leşkeran ji têlsizên cerdewanan re anonsa "Xwe tevli koma 9 kesî ku li çiyê ne nekin" kirine. Ev dê çawa bê ravekirin?

✓ Tevahiya vî gundî di referandûmê de tevli boykotê bûye. PKK çima li hemberî wan çalakî li dar bixe?

✓ Heta niha PKK li kijan çalakiya xwe xwedî derneketiye?

Ev pirs hemû li benda bersivandinê ne. Ji ber ku ev pirs nehatine bersivandin gelê li herêmê dijîn, dibêjin "Komkujiyê dewlet pêk aniye"




# Boykota Dibistanan

**ZAHAR ERCAN**

Ev boykota dibistanan duyemîn boykota kurdan e ku ji bo perwerdehiya kurdî tê kirin ji aliyê TZPKurdî ve hatiyê destpêkirin û ligel piştgiriya gel gelek sazî û dezgeh jî piştgiriyê didin vê çalakiyê. Ev boykota dibistanan ji bo perwerdehiya zimanê zikmakî ye. Mirov divê baş bizanibe ku hîmê netewebûnê bi ziman tê avêtin. Dema ku zimanê zikmakî bibe zimanê fermî dê bi xwe re xweseriyê jî ava bike. Ji bo vê yekê jî dive ku ciwanên kurd xwe bi her awahî pêş bixe û bi taybet bi zimanê xwe, xwe bide naskirin. Di serî de divê bê zanîn ku dewlet li ber vê yekê bisekine dê kurd malên xwe vegerinin dibistanan zar êşêrîn kurdî ferî zarokên xwe bikin. Dê kurd di her taxî de qad vegerînin dibistanan û dersên kurdî bidin.

Di nav vê pergala ku em tê de dijîn vî gelî, ji çand, dîrok û ji zimanê vî hatiye dûrxistiyê. Ev pergala yekparêz û înkarger, me ji zimanê me hem dûr dixe, hem jî zimanê xwe li ser me bi darê zorê ferz dike. Êdî em ê jî li hemberî van zordariyan serê xwe wekî qurbaniyan daneynin ber kêra asîmîlasyonê û her malekî bikin dibistan û di her taxê de rêxistina xwe xurt bikin daku dijminên yekparêz xwe li ber me nikaribe bigire. Dema ku dewlet gavên erênî neavê jî divê em ê bi berxwedanekî bêhempa zimanê xwe bidin pejirandin. Lewre dema ku mirov zimanê xwe nizanibe di her awahî de paş dikeve ji berk u ziman mifteya ramanê, hiş û mêjiyê ye. Mirov dema ku bi zimanê xwe nizanibe an jî hewlnede ji çavkaniya zimanê xwe yê zikmakî têhna xwe neşkîne ew bi xwe bi dilxwazî li hemberî pergalê xwe dîl dixe ku dî dîroka kurdan de têkçûn hene lê dîlketin tune ne kesên ku di warê ziman de xwe bi dilxwazî radestê pergalê bike ew îndî ne kurd ne tirk ne jî tiştek din e.

Ez carnan dinêrim hinek ciwan navê wan bi kurdî ne lê qet danûstandinên wan bi navê wan re nîn e ango tu eleqeya wan bi kurdî re nîn e. Bi rastî ev nakokî civakê di warê derûniyê de nexweş dixe, ji berk u qalib û naverok ji hev cuda ne yekbûnek nîn e tu xêr jî jê nîn e. Ev bi rastî jî tiştekî pir şaş e, daxwaza min ew e ku gelê kurd di serî de bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin û kurdî bi wan bidin hezkirin daku zarok bila kurdî bixwînin, binivîsin hêdî çêtir bila zarok bi kurdî bîlizin. Banga min ew e ku bila kes hefteyek neçin dibistanan û xwendekar tev de tevli boykotê bibin.

# Ziman û Xweseriya Demokratîk

**ERDOGAN ALTAN**

TZPKurdî ji bo bidestxistina mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî, biryar daye ku di rojên 20-25'ê Îlonê de dibistanên tirkan bêne boykot kirin.

Ev biryar û hewldana wan, hêjayê pîrozkirinê ye.

Lê ji bo, ev hewldan wek hewldan û rêzeçalakiyên berê ji bo daxwaza 'Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî' qels nemîne, tenê boykotkirina dibistanên fermî têr nake. Ji bo vê jî divê, pêşî hişmendî çêbibe. Divê ev hewldan wisa xurt bibe, da ku çewa berê de axaftina bi kurdî şerm (fedî) dikirin, wisa jî yên ku bi zimanê zikmakî neaxive şerm bê dîtin. Destpêka hişmendiyê jî divê ji siyasetmedar û nûnerên sazî û tezgehên kurd, dest pê bike. Lewre, divê siyasetmedarên kurd xwe ji hişê, "ji xwe ez bêjim 'ez anlamiş dikim lê kendimi ifade edemiyorum' dê dev ji min biqerin", de xilas bikin. Nexwe, her çiqas parazvanên zimanê kurdî di axaftina ziman de israr bikin, dê ji hêla van kesan ve wekî 'şov dike' bê dîtin.

Xweseriya Demokratîk ancax bi rûniştandina ziman dê bê avakirin. Lewre, lingê bingeha herî xurt a xweseriya demokratîk dê bi guman ziman e. Nîşaneya xweseriyê ziman bixwe ye. Dema mirov bibêje ez serbixwe me, dê pirsa 'tu bi kîjan zimanî diaxivî' bê kirin. Lê heke, tu bibêjî 'kurdî ye' û tu nikaribî bi zimanê xwe biaxivî, dê bibî pêkenokê xelqê. Ji bo vê yekî jî, hişmendiya axaftin, nivisandin û xwendina bi kurdî têr û tijî bi kurdan re ava bibe. Ango, lingê bingeha herî xurt a xweseriya demokratîk dê kêm bimîne. Bê guman ev yek jî têkoşînek xurt, dûr û dirêj pêwîst e.

Zimanê kurdî stûna banê mefûma gelê kurd e. Kurd bi awayekî herî diyar bi ziman û çanda xwe li ber çavan in. Divê ev stûna banê gelê kurd bê xurtkirin û têr û tijî kirin da ku pêşeroja xelkê me bi awayekî mîsoger hêmin û ji xetereyên asîmîlasyonê rizgar be.

Pirsa ziman û rawestana li dijî asîmîlasyon û bidestxistina mafê perwerdehiya zimanê zikmakî pirseke sereke û stratejîk e ji bo hemî kurdan. Digel kurdan divê mirov bala kêmneteweyên din jî bikêşîne ser çalakiyeke wiha û bi wan re, dezgehên wan re danûstendinê bike da ku ew jî bi xwesteke weha rabin û doza zimanê civata xwe bikin. Bi gotineke din divê ereb, laz, çerkez, ermen, suryanî, bi kurtasî her koma ku xwedî daxwazeke wiha bin, divê bê nav çalakiyeke wiha.

Divê hewldan di çerçoveya hewla çaremîn de pêk were.

Ji bo vê jî divê êdî em dev ji zimanê "zimanê min bidin min", "Em perwerdehiya zimanê zikmakî dixwazin", "Bila zimanê me jî bibe zimanê fermî" ango "Her tim em dixwazin lê nadin me, êdî em dev jê berdin", berdin. Divê em êdî zimanê "Em dê zimanê xwe bikarbînin", "Dewlet qedexe jî bike, nehêle em binivsînin, bixwînin û biaxivin jî, em dê pêkanîna ziman de bi israr bin", "Em dê bikin", "Me berdêl daye, pêwîst bike em dê hinekê din jî bidin" bê bikaranîn. Ji bo vê jî divê kurd bawerîya xwe xurt bigirin. Bi moral, coşek mezin û jidil tevbigirin. Di nava gel de, hişmendiya "Ez ê zimanên din ên biyanî jî hîn bibim, lê destpêk û pêşî zimanê xwe fêr bibim û pêş bixim" çêbibe.

Divê hemû aliyên kurd, di nava vê hewldanê de bin...

Hemû rewşenbîr, siyasetmedar, kom û civakên kurd ên, di hêla fikir û raman de cuda difikirin, piştgiriyê bidin vê hewldana TZPKurdî. Divê em vê kar û barê buhabilind nehêlin li ser milê TZPKurdî tenê. Bila hemû derdor û aliyên kurd baş zanibin ku TZPKurdî tenê pêşengiya vê hewldanê dike.

Welatperwer û dilxwazên ziman û çanda kurdî!

Ziman, zimanê me hemiyan e,
Çand, çanda me hemiyan e,
Ziman û çand, bingehên heyîna me ne...

Ji bo hevbeşiya ziman û çanda me, çalakî û tevgerên hevbeş hewce ne.

Karker, gundî, dewlemend, rewşenbîr, hejar, jin, mêr, kal û pîr, keç û xortên me tev bi vî zimanî diaxifin, difikirin, govendê digirin, stranan dibêjin, roman, novel û helbestên rind têne nivîsîn. Stranbêjên me bi vî zimanî dilê me geş an jî xemgîn dikin, bi vî zimanî derd û kulên me dilorînin. Dengbêjên me bi hêgîniya xwe ya dengbêjiyê her bi vî zimanî nîşan dan û nîşan didin.

Şakiro, Mehmût Kizil, Meryemxan, Kawîs Axa, Eyşe Şan û bi sedan stranbêj û dengbêjên me, her bi vî zimanî çandaa gelê me xemilandin, dixemilînin û xurt kirin û xurt dikin… Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û hemû şair û nivîskarên me, daner û berhemdarên çanda me her bi vî zimanî hebûne û hene.

Çiya, gelî, newal, deşt, zozan, kevir, rez û bexçeyên me bi vî zimanê navgirtine û bi wate ne.

Zîna Zêdan di xewna şevan de bi vî zimanê bûbû mêvana Memê Alan. Siwarê Bozê Rewan bi vî zimanî berê xwe dabû Cizîra Botan.Xoceyê Xasî û Melayê Batî bi vî zimanî em ji mewlîda Şerîf bêpar nehiştin.

Zimanê kurdî û bidestxistina mafê perwerdehiya giştî ya li ser bingehê perwerdeya mecbûrî dê derî li hemî daxwazên kurdan veke.

Asoya welat û miletekî azad li ser vê xetê ye…

Divê zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê li seranserê Kurdistanê.

Divê zimanê perwerdeyê kurdî û mecbûrî be.

Gav bi gav ber bi fermiyeta zimanê kurdî.

Hezkir û dilxwazên ziman û çanda kurdî!

Cudahiyên siyasî bidin aliyekê û bibin piştgirê doza zimanê kurdî!

Dê hadê kurdino qewet be!

www.arsivakurd.org

# Boykot mafê rewa yê xozayî yo

Boykota TZPKurdîy her ke şino hîra beno û rayîrberanê Tirkîya cira tersay. Kiliçî ard ziwanke mafê kurdan zî ze heme kesan esto ke bi ziwanê xo û bi çanda xo qisey bikerê û xo perwerde bikerê. Wa dewlet û hikûmet welîyaney gedeyan tehdît meko

**ENQERE - ANF -** Sereka pêroyinê Egîtim Senî Zubeyde Kiliç ard ziwan ke, boykotkerdişê mafê kurdan yê xozayî yo, qabê ziwanê xo boykot bikerê. Kiliçî bertekanê xo qabe wezîra karê perwerdeheyî ya tirkan, semedê ke vatibi, kurdîy dibistanan boykot kenêy ra, welîyanê gedeyan tehdît kerda ra nîşan da û waşt ke, heme kurdîy gedeyanê xo meeşrawê dibistanan.

Hinî eyseno ke destpêka akerdişê dibistanan ya dema 2010-11qabê tirkan bi jan ravêro. Çimkî TZPKurdîy boykota 1 hewte nêşîyayişê dibistanan da dest pê kerdiş. No boykot dê mohra xo na serrî ra bido.

Sereka pêroyinê Egîtîm Sena Tirkîyayî Zubeyde Kiliç ANFî ra ney mijarî sero nirxnayişîy kerdîy.

Kiliçî ard ziwan ke rayna bi problemanê gird perwerdeheya Tirkîyayî ya ney serrî da dest pê kerdiş. Ard ziwan ke eger Tirkîya di pereyê to bibêy se ti şikyenê biwanê eger çînê bo se ti nêşenê biwanê. Cayê ke perwerde bi ze meteryalê bikar bêro se ey cayî di problemîy zaf êy. Ard ziwanke perwerdeheya Tirkîyayî zanistey, demokratîkey, layîkey û gerdûney ra dûr o û vat: "Problemanê perwerdehey û hîndekarey resawo asta herî zêd. Di zagona esasî ya 42 di vajîyeno ke kes dê mafê perwerde û hîndekarey ra mahrûm nêveradeyo, eme çepê ci qanûn yeno binpaykediş. Bi skandala KPSSî problemî daha xişnî bîyê. No çî jana tirkan o. No mezg mezgê bezîrganeyî ya perwerdeheyî ra wo. Dersxaneyan di sektorê pereyanê girdîy geyrenê. Serr esto butçeya Mîllî Egîtîmî ra daha zafêrey pereyî geyrenêy. No çî zî qabê pereyan perwedehey vejeno orte."



### Problemanê zaf xorî estêy

Kiliçî ard ziwanke bajaran mîyan de zî gelîy estêy. Humara mamosteyan, qalîteya perwedeheyî, esasê fîzîkî û bîyişê amûranê dibistanan mîyanê herêman û bajaran di gelîyanê zaf xorî akedo. Ze her serran na serr zî gedeyanê ke xebatkaranê citkarey kenêy perwerde û hîndekareya xo ra bêpar mendêy û vat: "Lêkolînanê ma da eysayiş ke zaf kesîy dibistana serayetî qedîna pey ra nêwanenêy di ney mijarî di zêd bîyiş esto. Esasê ci de zî çînêbîyişê aborî serey ancena. Wendoxanê seqetan zî semedê kêmasîyanê sîstemî ra para xo nêşenê bigê. Kiliçî ard ziwan ke kiştê di mamosteyanê ke nêgirotê kar û kişta bînî de zî perwerde kerdişê mamosteyan di problemî zaf êy û vat: "Zafêreya mamosteyan nêşenê pîşeya xo îcra bikerê û no zî beno qelseya perwerdeheyî. No xeletîyanê sîyasîyan ra yeno. Mamosteya ze koleyan mahkûmê xebatîy kenêy. Ze heme memûran bi zagona 657'î, mafanê mamosteyan zî destê înan ra amewo girotiş."

### Boykot demoratîk o

Kiliç ard ziwanke mafê kurdan esto ke, dinyayî di heme zanistanê ke perwede danê û pedegologîy qebûl kenêy ke ziwan, heqê xozayî û esasê merdimahey a û vat: "Ma zanê ke gedeyanê ke di ziwanê dayika xo di perwerde nêvînenê di perwerdehey di zaf qels mananêy. Ze gedeyanê ke ziwanê makî di perwerde vînenê fam nêkenê û no zî beno semedê apeya mendişê înan. Ma apeya mendişî nêşenê qebûl bikerê û çîyê wina zî mumkûn nîyo ke ma mafanê gedeyan înan ra bigê û bi ziwanê dê bîyanî bimûsnê. Qabê ke no çareser bibo hetanê ney gamî hikûmatî qetîyen yew gamê zî nêeşto. Halkerdişê ney pêvajoyî çiqas erey bibo se hal daha xirabe beno û sîstema Tirkîyayî ya verê şîyişî de wo dê vinî bekero û dê paranoyayî dê bêrê vînayiş."

Wa heme kesîy jû bêrê tepiştişKiliçî ard ziwan ke, lazimo ke Tirkîya zagona xo ya esasî goreya şarî bivirazo. Ay vero çi şertanê gird estê gere bêrê wedaryayiş û vat: "Tirkîya di her demî di merdim şikyeno bi ziwanê makî perwerde bivdo. Eger di qanûno esasî di no bi ca bêrokerdiş se ma zî qabê ke perwerdeheya ziwanê makî çiçî îcap bikero ra xo hadre bikerêy. Çimkî Egîtîm Sen zî bi serranê derg o ke wazeno çîyê de wina bibo ke wa problemî kemî bibêy."

### Tehdîd a Çubukçu…

Wezîra Karê Perwedeheyî Nîmet Çubukçu qabê boykotî vatibi: "Welîyan^eke gedyanê xo merêşê dibistanî di goreya qanûnî çi ceza esto se dê bêro dayiş."

Qabê nêy qalanê Çubukçî ra Kiliçî vat: "Tehdîta wezîrî bi ze çîyê rûtîn ya tersayişî. Verê zî mamosteyanê bi peyman heqê xo waştibîy a zî, bi tehdîda karî ra vetîş û peymanê betalkerdiş ardibi ziwan. Zagonan goreya hesabê xo anê xo vîr.

Lazimo ke her tim goreya zagonan xo ta bidêy û serbikûrê. Vanê dibistana serayetî bê pereyo ema gedeyî bêperetey ra nêşnê bişêrê dibistanî.

Boykota 1 hewteyî ze darbe vînenê. Sifte gedeyanê kudan û yê zafêraya tirkan perwerdehey di binê sifirî de yê.

Çimkî nêşenê semedê aborey bişêrê. Ney demî di hetanê ney gamî 140 hezar gedeyan qeyda xo ya dibistanî nêviraştêy. Kesanê ke dibistanî terk kenêy zaf êy. Lazimo ke wezîre ney karî sero mezgê xo biqelifno."



# Dêrsimijan bi girseyî bendavan ra vat 'NÊ'

**DÊRSIM - DÎHAD -** êsimî di bendavanê ke îhale girotê û dest bi viraştişa Karatepe-1 û Haratepe-2 kerdîy. Qabê xebatanê sontajî şîrketa ke îhale girotêy ra, Hazal Hîdroelektirîk amebi cayê bendavan ke bixebityê. Eme şarê Dêrsimijî û dewijanê dormeyî bertekanê xo yê tûnd nîşan day. Bi seyan kesîy, rayîrberîy û partîyanê sîyasî pîya meşyay hetanê verê otelî û nobet tepiştîy.

Dêrsimî di tenê 14 bendavî qabê bivirazyê ra deweletî projeyanê xo vetî îhaleyan. Welatijî zî qabê ke bendavî nêvirazyê ra vanê ma rayîr nêdanê ke şima tîya di bindavan bivirazê.

Xebatkaranê şirketî qabê etûtî amey kewtê otelê. Amayişê înan şarî mîyan di ze ke sontajkarî amey pê hesyay. Nîm saetî di havîrdorhesî meydan Seyît Rizayî di amey pê het û qabê ke xebatanê bendavan bivê vindarnayişî ra bîy jû fek û jû veng. Siloganané ze, "Bendavan mevirazê ma dê sereyê şima di xirabe bikerê."

Mîyanê kesanê amey meydanî di, şaredara Dêrsimî Edîbe Şahîn, rayîrberanê sazî komaran û dezgeyanê, endam û serekanê partîyanê sîyasîyan, endamê grûba 2'yin ya aştî ra Aysel Dogan û bi seyan şar beşdarê qerabelixî bîy. Nîm saetî mîyan di meydana Seyît Rizayî pirbîy û verê otela Şaroglû di kewtî meşyayişî. Qerebalix zaf rayan rayîrî di slogana "Munzur namûs o namûsa xo ra wayir bivejyê", "Munzur tenganey di, Dêrsim îsyanî de wo" qîray.

Bedelê ci çiçî bibo dê bendavî nêvirazyê

Qerebalix ame verê otelî. Sontajkarî terasa otelî di ewnîyay îsyankaranê ke waştê bendavî nêvirazyê. Qerebalix zaf rayan înan yûhh kerd. Aktîvîst û fekverkê xozaya Dêrsimî Haydar Çetînkaya, kesanê ke nêwazenê Dêrsimî Terk bikerê wa hemeyî qabê ke bendavî mevirazyê ra bi hawayê aktîf xebatanê xo bikerê ra veng da û vat: "Dewlet û şîrketanê ke îhaleya bendavan girotê wa weş bizanê ke, şarê Dêrsimî ney ra pey destûr nêdano ke bendavî bivirazyê.

Bedelê ci se beno wa bibo, dê destûr meyro dayene. Ma biryara nêveradayişê sontajkaran ya gelîyî dawo. Êy dê nêşikyê bişêrê ûca û karê xo bikerê. Bendavî di mîyanê sînoranê parka mîllî di wazîyenê ke bivirazyê. No bê qanûn o dê ma nêvedê ke bivirazê.

Qerebalix nêveda ke karkeranê şîrketî bişêrê gelîyî xebat bikerê. Kişta bînî de zî havîrdohesî qabê bendavan kewtîy nobetî û hetanê ke biresê encamê xo dê nobeta xo berdewam bikerêy.

# AKP rayîrberê nêeşrawit cenaze

**COLEMÊRG / ANF -** Colemêrgî di teqîna ke gora qanitan dewletî kerdo, Erdogan û Gul vanê "PKKî kerdo." NeErdogan ne zî rayîrberê kesê zî nêeşrawitî merasîma cenazeyî û serweşey zî nêwaştêy.

Senî ke teqîneya ke Colemêrgî di bi semedê merdişê 9 kesan. Hikûmatî no qewimîyayişî eşt PKK'î sero û ra pey bûyerî amey cuyayiş.

Cayê teqînî di çanteya ke amewo vînayiş di bombeyî û amûranê bînan amey vînayiş nêy hemeyî aîdê leşkeranê dewletî bîy. Kişta bînî de zî madeya teqnayişî ya antîtanq 2 hebîy di çanteyî di amey vînayiş.

Kişta bînî de zî tikeyan goşdaranawo ke di bêtêlî di anos amewo kerdiş ke amûranê xo cayê qewimîyayişî di viradayê.

Di encama teqînî di 9 kesan cuyê xo vinî kerdîy. Pey teqînî ra ne operasyon ne zî cigeyrayişê nîyame kerdiş.

No zî bala beno ke bala daha weş bonco hezanê dewletî sero. Erdogan û Gul û rayîrberî bi lêkolîn vatîy PKKî kerdêy.

Bi ney hawayî zî JÎTEM ame pawitene.

Rayîrberî erê medya di serweşey waştêy ema, hetanê ney gamî malbatanê înan nêgeyrayê û serweşey kesan ra nêwaştêy.

Hetanê ney gamî rayîrberanê dewletî ra kesêy zî nîyameyê cayê qewimîyaşî ra ze sûdarey ey xo danê mojnayiş.



# Rojên bê sîber -II-

Piştî ku em gihiştin cem hevalan û bi riya bêtêlê em bi hevalan re axivîn. Me bi bêtêlê bangî wan kir. Min bo ku cihê me kişf bibe bi wan re axivî

RIZGAR ÊRSÎ

Heval bi rê ketin û min jî di nava darekî belalûkê de xwe veşart. Dara belalûkê di biharê de li pêşiya hemû darên din dipişkive. Min di nava kursekî tarî ya darên belakûkê de xwe veşart. Dijmin xwe gehande cihê ku min xwe lê veşartî û li jor û jêrî cihê ku ez lê disekinîm geriyan. Di wê navberê de min dît ku hevaleke jin li wan derdoran diçe û tê. Wê hevalê dema ku min xwe li vê derê vedişart, ji dûr ve ez dîtibûm. Ew jî hat û xwe li cem min veşart. Dema ku min ew heval dît, min gazî wê kir. Navê wê hevalê jî Rengîn bû û ew bi eslê xwe ji Efrînêbû. Bi wî awayî em mecbûr man ku cihê xwe biguherin. Em çûn û heyanî êvarî me xwe di pesara dolikekî de veşart. Ber bi êvarî ve min li bêtêla biçûk guhdarî dikir, dijmin digot: “Em ê xwe bi rengekî çeprast ber bi dolê ve berdin.” Cihê ku dijmin behsê dikir jî li binya cihê ku em lê disekinîn bû. Dema ku min li axaftinên dijmin guhdarî kir, min ferq kir ku dijmin ê di cem me re xwe berde. Ji ber vê yekê min ji hevala Rengîn re got: “Ka qenasa xwe bide min.” Çeka qenasê bi wê hevalê re bû û tenê narincokek bi min re hebû. Min çeka qenasê ji wê hevalê wergirt û naricoka xwe da destê wê. Pir caran dema ku ez vê bûyerê ji hevalan re vedibêjim, bi rastî cesaret û ruhekî xurt pêwîst e ji bo ku tu bikarî naricokekî bi xwe ve biteqînî.

Min nedixwest ku ez naricokê biteqînim. Ji lewre min ji wê hevalê re got: “Hema were li cem min rûne, ez ê bi çeka qenasê li dijmin bixim, heyanî min karî ez ê şerbikim û dema ku te dît êdî rewş ber bi xeteriyê ve diçe û em ê bikevin destê dijmin de, wê çaxê tu dikarî naricokê bi min û xwe ve biteqînî”

Hevala Rengîn bi xwînsarî narincokê girt nava destê xwe, pîmê wê rast kir û li cem min rûnişt. Weke niha di bîra min de ye, serbazek hat û bi qederê dusê gavan nêzîkî me bû. Dema me xwe li wê derê vedişart pêlavê min ji lingê min derketibû û gêrbûbû jêrê. Ew serbaz hat kete navbera me û pêlava min a gêrbûyî re derbasbû û çû. Wê demê wî serbazî xwest were û li cihê me jî bigere. Lê ji ber ku baran dibariya û herder bûbû herî û erd şemitok bûbû. Li pêşiya cihê ku em lê disekinîn tehtekî pehin hebû û baranê ew teht şilkiribû û hilûkiribû. Dema ku wî serbazî xwest bi çiqlê darekî bigre û bi ser wê tehtê re ber bi cihê me ve were. Gava xwe avête ser wê tehtê, lingê wî ji ser tehtê şemitî û kete xwarê. Hingî rabû ser xwe û EM-16 xwe avête pişta xwe û çend sixêv di ber xwe de kirin û bi şûnve zivirî.



Me ferq kir ku hemû leşker derbasbûne. Jixwe me ew dişopandin heyanî ku pira li ser avê derbaskirin û çûn. Em wê demê têgihîştin ku beşek ji erdîngariyê vala hiştine. Min ji hevala Rengîn re got: “Biçe wî cihê ku ez lê birîndar bûme bigere, dibe ku heval werin wê derê û li me bigerin. Ez ê jî hêdî hêdî ber bi wê derê ve bêm.” Hevala Rengîn dema digehe wê derê, pir deng derdixîne û gazî hevalan dike. Ji ber wê yekê dijmin dîsa li me xist, min jî di wê navberê de qîr kir û min got: “Heval çima tu deng derdixînî? Dengê xwe dernexîne ma ne hîna dijmin li derdoran heye.” Dema ku min gazî dikir, wê hevalê texmîn dikir ku ez jêre dibêjim were cihê xwe yê jor. Ji ber wê yekê ew tê û derbasî cihê me yê jor dibe û ez jî derbasî milê din dibim. Ez wisa ber bi cihê ku em roja duduyan lê ketibûn pevçûnê ve hatim, li wê derê hevalan hinek kelûpelê xwe hiştibûn û çûbûn. Ez bi tenêbûm. Li wê derê bintehtek hebû, min xwe xiste bin wê tehtê de û min ji xwe re got: “Heyanî êvarî ger dijmin li derdoran hebe jî bila min nebîne.” Ew heval jî dema ku diçe û cihê roj dimeyzîne û dibîne ku ez ne li wê derê me, dîsa ber bi cihê me yê em li wê derê ketîn pevçûnê de tê. Di wê navberê de min dengek bihîst, lê ez têgihîştim ka dengê kî ye û min texmîn dikir ku dengê dijmin e. Min digot qey ji dervî dijmin êdî wê kesekî din bi vî sirtî re neyê. Her diçû deng nêzîkî min dibû û bi wî rengî min jî lingê xwe dikşand ber xwe de. Dema ku min lingê xwe dikşande ber xwe wê jî ferq dikir ku dengek tê. Paşî min dît ku vaye dîsa hevala Rengîn hat.

Tê bîra min wê demê min xwe aciz kir û min ji hevala Rengîn re got: “Te çima wisa kir, ew tişta ku te kiriye hindik mabû bibûya sedemê mirina min û te.

Xêncî wê ji xwe ew du-sê rojbûn ku me xwarin nexwaribû, hevala Rengîn rabû û hinek şekir, ard û av li nav hev xistin û ji min re got: “Pêwîst e ku tu hinekî bixwî, ji bona ku tu bikaribî bimeşî” Piştî xwarinê me xwe ber bi jêr ve berda. Em ber bi cihê ku roja yekmîn em û dijmin lê ketin pevçûnê ve çûn û me xwe xiste nava wan şikêr û konçalan. Dema em çûn wê derê me meyzand ku vaye tiştê me hemû wekî xwe mane. Dijmin ketibû nava hemû deran, lê destê xwe nedabû tiştekî. Hevala Rengîn xwest çayekî an jî xwarinekî çêbike. Ji ber ku hemû tiştên pêwîst li wê derê peydadibûn. Ez jî li wê derê rûniştim û ew heval jî çû hinek êzingan berhev bike. Hew min dît ku hevala Rengîn da ber qîran û bazda ber bi min ve hat. Min texmin kir ku wê hevalê li wê derê leşker dîtine, vejniqî ye û ji nişkan ve, bê hemdê xwe daye ber qîran. Min destê xwe yek ser avête qenasê û min xwe hazir kir. Hevala Rengîn hat û min jê pirsî: “Çi bû te wisa qîr dida?” Ji min re got: “Ew her sê kesên ku xwe radestî dijmin kirin, dijmin ew li wê derê kuştine.” Ji kuştina wan hersê kesan diyarbû ku dijmin tu encam ji wan negirtine û binkeftina xwe ya heyî xwestiya bi kuştina wan binixumîne. Dijmin bi hovîtiyekî bê sînor ew hersê kes kuştibûn, şewitandibûn û avêtibûn wê erdê.

Bi wî rengî me meşa xwe berdewam kir. Jixwe min zêde nikarîbû ez bimeşim. Ji ber wê meşa şevekî me dikir sê-çar şev. Em dîsa di wî gelî de hatin cihekî û li wî cihî darên tuyan pir bûn. Me wê rojê heyanî êvarî debara xwe bi wan tuyan kir.

Hinek tişt di dîrokê de tên jiyankirin û gelek caran li ser mirovan bandorekî mezin dikin, nimûne ew du-sê şevbû ku ew heval bi min re bû û her dem hişedariya min û xwe dikir. Herdem şiyarbû, heyanî gelek caran dema ku ez bixew ve diçûm, wê hevalê nedihişt ku mêş bidin birîna min. Bi wî awayî nedihişt ku kurm bikevin cihê birîna min. Jixwe tu derman jî li cem me peyda nedibû. Hevala Rengîn nêzîkatiyeke hevaltî ya bê sînor li beramberî min dida nîşandayîn û ew jî rastiya ruhê hevaltiya PKK’ê bû. Bi rastî jî vî ruhê hevaltî yê pir bandora xwe li ser min dikir.

Me meşa xwe domand û em gihîştin rêka qîr a ku diket dewriya me de û pêwîst bû ku em wê riyê qutbikin. Ji wir û pêve em ê hêdî-hêdî nêzî cihê hevalan bibin. Em li ser cadê rûniştin, dinya jî tavaheyîv bû. Ez li wê derê bi xew ve çûm, min carekî dît ku hevala Rengîn destê xwe li min da, ez ranebûm, lê dema ku careke din destê xwe li min da, ez ji xewê şiyar bûm û min got:

“Çi qewimî?” Wê hevalê bi îşaretan ji min re got: “Vaye hinek mirov ji wir ve tên.” Min jê re got: “Baş e qet tu dengê xwe neke, dibe ku me nebînin û derbas bibin.” Ji xwe me ji xwe re digot: “Bêguman dijmin e” û me texmîn nedikir ku kesekî din di wê riyê re were. Dema ku ber bi me ve hatin û derbas bûn me li wan temaşekir. Sê hevalê xortbûn û hevalek jî jin bû. Me yekser gazî wan kir û ew jî ber bi me ve hatin. Min ji wan pirsî “hûn bi ku ve diçin?” Wan jî li me zivirîn û gotin: “Em ber bi erkekî ve diçin.” Li ser vê ew heval ber bi erka xwe ve çûn û em jî ber bi cihê hevdîtinê ve hatin. Li nêzîkî cihê me şikeftek hebû, em her tim dihatin wê derê, ew şikeft jî nêzîkî gundê Mêrgê bû. Em dihatin û me li wê derê bêhna xwe vedida, me ji xwe re agir hildikir. Dema ku em gihîştin ber derê şikeftê, me hew bihîst ku dengek ji hundirê şikeftê tê. Piştî şeş rojan em gihîştin wê derê, dengê nale nalekî dihat. Ji dengê ku dihat mirov dizanî ku ev dengê yekî nexweş e. Me ji xwe re digot: “Dibe ku hevalê birîndar hebin.” Dema ku em ketin hundirê şikeftê, me deng derxist û me gazîkir ka kî li vêderê hey e, lê kesî bersiva me neda.

Me hew dît ku vaye ew hevalê ku roja yekemîn jiber nexweşiyê ji me veqetiyabû û nikarîbû bi me re bimeşe di hindirê şikeftê de raketiye. Jixwe me wê gavê her tiştê wî hevalî jê girtibûn û me pêdiviyê wî dabûnê û me jê re gotibû “pêwîst e ku tu xwe bigihînê cihekî tê naskirin û xwe ji operasyonê biparêz e.” Wî hevalî jî demekî dirêj di nava dijmin de û bi saxlemî xwe gihandibû wê derê, lê gelek westiya bû û ji hal ketibû. Me ew heval bi xwe re girt û me berê xwe da cihê hevdîtinê. Piştî ku em gihîştin cem hevalan û bi rêya bêtêlê em bi hevalan re axivîn. Me bi bêtêlê bangî wan kir û min ji wan re derdorê dida naskirin. Bi vî awayî heval hatin û em hildan.

## Cîhana bextewar

*Ez tu carî nazivirim bajarê ku tu lê dimayî...*
*Ez tu carî nazivirim war û derdorên ku tu lê diborî...*
*Dilê min ranake wê êşê, zû zûka nikarim ragirim wê hecim û giraniya bîranînên bedewiya te, nikarim hilgirim wê tegl û teqna bêrîkirina bejn û bala te.*

*Erd bim jî ez ê bihejim û bidewixim.*
*Berf bim jî ez ê bihelim û herim tevdilhewayê.*
*Pola bim jî ez ê...*
*Niha dimeyînim hesreta hembêzkirina te di hawênê hebandina xwe de. Mîna meyandina movka meyê...*
*Hewqasî tirş bûye û piçpiçok ser ketine ku piçekî tenê jî badana berga wê têra serxweşkirinê dike.*
*Xembarî jî û bextewarî jî hene di nav wê kambaxa serxweşiya serê xwexwariyê de...*
*Paradoksa toplêketî ye; şeraba şerbikê şûnwarên şewitî çiqas şîrîn be, ev hesreta hûsn û cemala te jî hevqasî şîrîn e, wek hungivê helandî dimîne bi hetasa hestên har ve: wan diesirîne,wan dieciqîne...*
*Dûr bim jî bi hesret im.*
*Nîzîk bim jî bi hesret im.*
*Têgehên ”dûr”û ”nîzîki”yê jî êdî mehiline di hawê heyama hişweriya bextê balix de.*
*Dîwarek tenê be jî di navbera me de nagihîjim te, reşperdeyeke bextreşiya bêawa tenê be jî nagihîjim te,nikarim bêm cem te. Ma ku nikaribim wek mengena serdemên sergomkirî navkêlziraviya te bigêvêşim di nav zendên ji diyariyên te bazbenkirî, bi kêrî çi tê ev cîhana bêsikûm?*
*Tûh, qeda pê bikeve!*
*Û diyariyek dualî ya di nav nîvê navka bazbendê de:Êdi taswîrên kevin*
*Bi tevahî didim alî*
*Ji pêş çavên xwe*
*Cîhaneke ji te pêkhatî*
*Tenê û tenê ji te pêkhatî*
*Ava dikim di xunava xeyalên xwe de...*
*Oxx!çi xweş e. Ev cîhana bextewar!*

**ZEKÎ KAYAR**

## Qerf Henek

### Reco bûye parêzerê TÎT’ ê




### Çapemeniya tirk rastiyê berevajî dike




www.arsivakurd.org

# Hakan Karsak 'Min Dît'ê vegot

Di îlona 2009'an de fîlmê bi navê Min Dît ê derhênerê kurd Miraz Bêzar yekemîn xelata xwe ya cîhanî ji bajarê San Sebastianê wergirtibû, wekî tê zanîn Min Dît gelek xelatên din jî standibû

Zinar ALA-SAN SEBASTIAN

Îsal jî lîstîkvanê sereke yê di fîlmê "Min Dît" de Hakan Karsak ji bo mîhrîcana 8'emîn a Sînamaya û Mafê Mirovan li bajarê San Sebastian (bi zimanê baskî Donostia) hatibû vexwendin, bi dehan kurtefilm û fîlmên dirêj beşdarî vê mîhrîcanê bûn, di nav van fîlman de du film hebûn ku behsa kurdan dikirin fîlmê fransî "Welcome" û fîlmê "Min dît / Zarokên Diyarbekir" her du film jî di heman rojê de jî hatibûn nîşandan.

Berî nîşandana fîlmê "Min Dît" di teatra Victoria Eugenia de Hakan Karsak bi çepikên germ ji aliyê cemawerê mîhrîcanê ve hate pêşwazîkirin. Lîstikvanê sereke yê di "Min Dît" de ku senarîstê fîlmê Evrîm Alataş bi bîr anî û got: "Evrîm niha ne di nav me de ye, em pir ji wê hez dikin û em bêriya wê dikin". Hakan di dawiya axaftina xwe de li banî nihêrî û got: "Em dizanim ku niha ew li jorê me dibîne, em serkeftina xebata xwe diyarî Evrîmê û hemû zarokên kurd dikin".

Me li bajarê San Sebastian ligel lîstîkvan Hakan Karsak li ser listikvaniya wî û fîlmê sohbetek kir.

Cara yekmîn Min Dît li cîhanê li welatê Baskê di Mîhrîcana San Sebastianê de hatibû nîşandan, û cara pêşî li Tirkiyê di Mîhrîcana Antalyayê de hatibû nîşandan, Hakan Karsak ê di rola sereke ya Mîn Dît'ê de dilîst hestên xwe yên derbarê mîhrîcanan de wiha anî ziman:

"Di mîhrîcana San Sebastianê yekemîn car ez xwe di sînamyê de dibînim, min xwe li ser perdeya spî didît lê min tiştekî fam nedikir, ango min nizanîbû rastî bû yan jî xewn bû, di dawiya fîlmê de ji xewna xwe şiyar bûm û min got: "Belê, ev xebatekî mezin e ji bo Kurdistanê". Li aliyê din jî min hêstir di çavên gelek kesan de dîtibû, gelek ciwan hatin silav dan me û hinekan jî Miraz Bêzar hembêz kirin. Gelekan li pey hev di dorê de sekinî bûn ta ku dengên nirxdayînê bidin fîlmê.

Li mîhrîcana Antalyayê dîsa di hundirê salayê de reaksiyona cemawer gelek xweş bû, nêzîkî 800 kes hebûn, piştî dawîbûna fîlmê hemû rabûn ser piyan û dengê çepikan bilid bû, lê vê carê ez bi tirs dihasiyam û min digot piştî dawîbûna nîşandana fîlmê polîs wê li ber deriyê salayê li benda min bin. Di civîna çapemenî de kesên nijadperest hebûn û ji me re digotin Hûn çawa dibêjin ka welatê min Kurdistan?"




**Diyariyê Alataş kir**

Karsak di Mîhrîcana San Sebastiyanê li ser dika teatroya Victoriya Eugeniayê de li ser Evrîm Alataş axivî û serkeftina fîlmê diyarî wê kir. "Wek hûn dizanin Evrîm di 12'ê nîsanê de jiyana xwe ji dest dabû, ev windabûnek mezin bû ji bo Kurdistanê, Evrîm mirovekî û nivîskarekî pir baş bû, Evrîm wekî Mihmed Uzun dê herdem di dilê Kurdan de dimîne, em wê ji bîr nakin, em ê her çax wê bi bîr bînin.

Karsak di fîlmê de di rola JÎTEM'iyek de lîstibû derbarê rola xwe de ev tişt gotin: "Berî ez bersiva pirsa we bidim, tenê dixwazim behsa bandora nîşandana Min Dît li mîhrîcana Antalyayê bikim, ji ber ku em hemû kes li Tirkiyê dizanin ku JITEMê li Kurdistanê bi karê kuştinê radibûn, û kiryarên kuştinê di bin navê **kiryarên nenas** de dihtein qeydkirin. Lê piştî mîhrîcana Antalyayê Hem hikûmet hem jî artêş gotin ku ew JITEM nas nakin, JITEM rêxistinek e îlegal e. Rola min ji aliyê kurdan ve gelek hate ecibandin, lê li aliyê din jî kesên ku ji vê kesyetiyê heznekirin pir bûn.

Li kolanan hinekan li min dinihêrîn û bi tiliyên xwe nîşanî min dikirin û digotin "Em ê serê te jêkin", gelek email, telefonên tehdîtkirinê ji min re dihatin, têde dijûn li min û malbata min dikirin, bi xiyanetê ez tawanbar dikirim û her wiha nameyên tehdîtkirinê di bin derya malê de jî dihiştin". Gelek hevalên min yên zanîngehê û teatroyê ji min re gotin: **'Êdî tu ne hevalê me yî'"**

Hakan Karsak bi kurdî nizane lê ji bo hînbibe jî hewldide Karsak diyar kir ku hevalê wî yên şanoger ji bo kurdî alîkariya wî dikin, ew jî teksta lîstikê ji ber dike û rola kesaytiya xwe dilîze. Karsak der barê projeyên xwe yên dema bê jî wiha got: "Ez zêde xebata şanoyê bi zimanê tirkî dikim, niha em difkirin ku em çîrokên kurdî bi tirkî pêşkêş bikin wek Mem û Zîn, Cembelî û Binfeş û hwd."

# 5'emîn Mîhrîcana Fîlman a Mêrdînê dest pê kir

MÊRDÎN-Mîhrîcana Fîlman a Mêrdînê "SîneMardin" îsal cara 5'an di navbera 17-23'yê Îlonê de li dar dikeve. Di festîvalê de belgefilmê Kazim Oz ê bi kurdî "Demsala Dawî: Şewaxan", fîlmê Miraz Bezar "Min Dît", fîlmê Ozcan Alper "Sonbahar", fîlmê Mahmut Fazil Coşkun "Uzak Îhtîmal", fîlmê Yilmaz Erdogan "Neşelî Hayat", fîlmê Ezel Akay "Yedi Kocali Hurmuz" û fîlmê Bahadir Karakaş "Usta" jî têde ji Tirkiye û welatên din gelek film têne nîşandan.

Mîhrîcan bi taybetî li ser senaryoyên fîlman kûr dibe û îsal jî li ser analîza fîlman û senaryoyê atolye têne lidarxistin. Bi beşdariya hunermendên ciwan ên sînemayê, derhêner û xwendekar dê çalakî li dar bikeve û gel dikare beşdarî wan bibe.

Her wiha îsal di mîhrîcanê de beşa mîhrîcana gerok heye. Sehneya ku li ser tirê çêkirine dê li navçeyên Mêrdînê fîlmên anîmasyonî yên japonan nîşanî zarokan bide.Di mîhrîcanê de ji Almanya, Hollanda, Amerîka fîlmên derhênerên wekî Ken Loach, Costa Gavras, Francois Ozon, Birayên Coen bêne nîşandayîn

Yek ji taybetiyên SîneMardînê jî ew e ku ligel ku li Mêrdînê mîhrîcan li dar dikeve, bi heman awayî li Helebê jî ev mîhrîcan li dar dikeve. Li Helebê di navbera 21-23'yê Îlonê de li dar dikeve û li Halep/Alepo'yê dê fîlm bêne nîşandan.




# 'Roja Helbesta Kurdî' li benda helbestvanan e

BOTTROP-Roja Helbesta Kurdî îsal pêncemîn car li Almanyayê li dar dikeve.

Çalakî li benda helbestvanên kurd e. Ji sala 1993'yan de, her sal, di roja koçkirina helbestkarê nemir Seydayê Cegerxwîn de, li rojavayê Kurdistanê, Roja Helbesta Kurdî tê lidarxistin.

Her wisa li derveyî welêt, li Almanyayê jî ev cara pêncan e ku, bi heman armancî, helbest van û wêjehezên kurdên rojava li hev dicivin.

Komîteya amadekar a "Roja Helbesta Kurdî ya li Derve" îsal jî, helbestvanan û helbesthezan vedixwîne bajarê Bottropê li Almanyayê, da ku di roja şemiyê, 16'ê cotmeha 2010'an, careke din hem helbestên xwe bixwînin, guhdarî bikin û hem jî helbestvanê nemir Cegerxwîn bibîr bînin.

Komîteya amadekar ku ji Keça Kurd, Elî Cafer û Helîm Yûsiv pêk tê dixwaze helbestvan û helbesthezên ku bixwazin beşdarî çalakiyê bibin bi e-maîleke xwe bigihînin wan. E-maîla têkiliyê ya bi komîteya amadekar re ev e: ***roja-helbest2010@hotmaîl.de***

Her wiha di salona helbestxwendinê de dê wêneyên çend şêwekarên kurd jî bêne daliqandin û pêşkêş kirin. Ango zimanê helbestê û yê wêneyan dê di şeva 'Roja Helbestên Kurdî' de bibin yek û bi kurdî hev hembêz bikin.

Dîsa di warê muzîkê de jî wê stranbêj Zubêr Salih derkeve ser dikê û hin stanên xwe pêşkêş bike.



# Ji NÇM'ê ji bo dema nû kursên nû

STENBOL-Navenda Çanda Mezopotamya(NÇM) şaxa Stenbolê ku yek ji saziya herî girîng a ji bo çand û hunera kurdî ye. Bi meha Cotmehê re di hemû beşên hunerî de kursên dema nû vedike.

Navenda Çanda Mezopotamya(NÇM) şaxa Stenbolê ku di sala 1991'an da hate avakirin. Ji roja avakirina NÇM'ê heta îro îmzeya xwe avêt gelek xebatên çand û hunera kurdî. NÇM di meha cotmehê de di serî de kursên wekî sînema, şano, dans û muzîk di gelek beşên hunerî de kursan vedike. Di beşa muzîkê de, wekî bilûr û amurên enstrumanan, def, bilûrê rojavayî, gîtar, perwerdehiya muzîkê, şan û şolfej dê bên dayîn. Perwerdekar bi riya perwerdehiyê dê endamên nû ji bo muzîkê derxin û perwerdehiya muzîkê bo pêşketina mirovan girîng e. Kesên bixwazin dikarin serî li NÇM'a Stenbolê bidin.

www.arsiv.kurdi.org

Rupel 12++++++:Layout 1 18.09.2010 14:27 Page 1


# Rojeva Welat

19 Îlon 2010 Hejmar: 12 Sal:1 www.welat.com

ROJEVA WELAT
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Sevim KAPLAN

Yönetim Yerî: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No:9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88

Yayın (Weşan) TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89

Baskı (ÇAP): Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece / İstanbul Tel: 0 (212) 580 63 81

Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan / Adana

Yaygın süreli yayındır.


# Mala Piştgiriya Perwerdehiyê ya Mem û Zînê hate girtin



Mala Piştgiriya Perwerdehiyê ya Mem û Zînê ya Qaxizmanê ku di îlona 2009'an de hatibû vekirin, ji aliyê Qeymeqamê bajêr ve hat mohrkirin. Ciwanan eleqeyek baş nîşanî saziyê dida



**QERS / DÎHA -** Mala Piştgiriyê ya Perwerdehiyê ya Mem û Zîn ku ji hêla Şaredariya Qaxizmanê ve di îlona 2009'an de hatibû vekirin, di encama serdagirtinê de hat girtin.

Mala Piştgiriyê ya Perwerdehiyê ku ji hêla Şaredariya Qaxizmanê ve hatibû vekirin û 400 xwendekarên wê hene, pêr êvarê ji hêla polîsên girêdayî Midûriyeta Polîsan a Qaxizmanê ve hat serdagirtin. Mala perwerdehiyê beriya niha jî ji hêla Qeymaqamiya bajêr ve bi hinceta girêdayî Midûriyeta Perwerdehiyê ya Neteweyî naxebite, hêj ku pêvajoya dadgehê bi dawî nebûye hate mohrkirin. Rayedarên şaredariyê xwendekaran ji ber haya wan ji mohr kirinê tune ye bertek nîşanî polîsan da. Di encama nîqaşên ku 2 seatan domkir de, polîsan mamoste û xwendekar derxistin û dersxane mohr kir. Alîkara Şaredariyê Çigdem Ozlu, bertek nîşanî mohrkirinê da û destnîşan kir ku ew 400 xwendekar didin xwendin. Ozlu, anî ziman ku dema wan li vir dersxane vekir li navçeyê tenê dersxaneya Cemaata Gulen a FEM hebû û wiha got: "Ligel vekirina me tu kes êdî neçû dersxaneya FEM'ê. Li ser vê yekê Qeymeqamiyê ji her dibistanê 15 xwendekarên ku pereyê wan ji hêla Qeymeqamiyê ve hate dayîn, şand dersxaneya FEM'ê. Ligel vê yekê der barê me de bi hinceta ku em ne girêdayî Midûriyeta Perwerdehiyê ya Neteweyî ne doz hate vekirin. Hê ku doz bi dawî nebûye bi awayekî bê hiqûqî dersxaneye me hate mohrkirin. Ji bo xwendekarên me mexdûr nebin em ê ji bo ku dersxaneya ji nû ve bê vekirin, serî li riyên hiqûqî bidin."

## Menenjît nexweşiyeke çawa ye?

Menenjîta nêmî, bi riya şewba Haemophilus çêbûye(di loba navîn amêjiyê de). Menenjît (bi latînî: Meningitis) yek ji nexweşiyên mîkrobîk e.

Trawmayên qaqotê serî, hin cureyên nexweşiyên guh dikare bibe sedemê mîkrobgirtina vê nexweşiyê. Bi taybetî li cem zarokan bixetere ye. Hin nîşaneyên sereke yên wekî alerjî ji tîrêjê, serêşa zêde, zêdetîna (agirê zêde) laş, madelihevketin an verêşan rû didin.

Nexweşî li gorî asta xwe bi hêsan an dijwar tê tedawîkirin. Divê dê û bav ji bo septomên wê baldar bin. *(hawar net)*

# Divê demildest pêşî li xetereyan bê girtin

**STENBOL -** Ji aliyê Yekitiya Hekîmên Beytaran a Tirkiyeyê ve daxuyaniyek hate dayîn û îthalata sewalên qesabiyê dawî li sewalkariyê tîne û bang kir ku bila demildest pêşî li vê yekê bê girtin.



Yekitiya Hekîmên Beytaran a Tirkiyeyê daxuyaniyeke nivîskî da û balkişand ser rewşa sewalkariyê ya Tirkiyeyê. Di daxuyaniya ku hate dayîn de wiha hate gotin: "Goştê erzan ku bûye hinceta îthalatê êdî bûye efsaneyeke bajar. Li welatê YE'yê û welatên pêşveçûyî goşt li gorî kalîteyê ji hev tê cuda kirin. Di encama vê de goştê reforme yê pola 2'emîn û goştê cihên sewalan yên bê kalîte di piyasayê de erzan tê firotin. Her wiha goştê bi kalîte yên wekî pîrzola, bonfîle li her derê cîhanê buhaye û li Tirkiyeyê jî buhayê vê ne erzan e."

Di berdewamiya daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Li Tirkiyeyê ji bo ku pirsgirêkên sewalkariyê bên çareser kirin divê şert û mercên bazaran bên başkirin. Divê daneyên alifê erzan bê tespîtkirin. Divê piştgiriya ji bo hilberîneran bê kirin."

Di dawiya daxuyaniyê de bang li nûneran hate kirin û gotin ku bila demildest pêşî li xetereyan bê girtin û wiha berdewam kir: " Ji ber sedema îthalatê rekabeteke newekhevî derdikeve holê. Ji ver vê hilberîner zirarê dibînin. Ji ber ku ev zirar bê telafîkirin divê bi komîsyonekî zirar bên tespîtkirin. Divê li ser buhayê ku ji bo goşt tê tespîkirin, piştgirî ji bo hilberîner bê kirin. Ji bo ku salên pêş ji vê yekê bên rizgarkirin divê ji her cureyê siyasetê xwe dûr bixînin û polîtîkayên rasyonel û dem dirêj biafirînin."

# Ji Şaredariya Bêgirê xebatek mînak

**WAN -** Şaredariya Bêgirê, Çemê DSÎ'yê ku tijî qirêj û gemar bû û bêhna genî li derdorê belav dikir paqij kir û ji bo ser çemî bigire ket nava hewldanan. Şaredarî piştî ser çemê bigire dê daran biçîne û bike park.

Şaredariya Bêgira Wanê bi boneya xizmetek baş bide gelê navçeyê û bajar paqiştir bike dest bi xebatên islahê kir. Şaredariyê Bêgirê bi boneya parastina derdorê Çemê DSÎ'yê ku di nava navçeyê re derbas dibe û bêhna qirêj li derdorê belav dike ket nava hewldanan. Şaredariyê çemê paqij kir û ser çemî girt. Şaredariyê piştî 400 metre ser çemî girt, bo qadek kesk ket nava xebatê. Xebata ku piştî mehekê bi dawî bibe dê ji xizmeta welatiyan re vebe. Şaredarê Bêgirê Îzzet Çelîk, diyar kir ku armanca wan ew e ku xizmetek baş û paqij bidin gelê xwe û ji bo bajarekî pêşketî her tim di nava hewldanan dene. Çelîk, da zanîn ku hundirê çem her tim qirêj bû û bêhna genî li derdorên xwe belav dikir. Çelîk, destnîşan kir ku hundirê çemî paqij kirin û ser çemî girtin. Çelîk, da zanîn ku dê piştî mehekê xebata wan bi dawî bibe û derdora çemî bikin qada kesk.





# Bila klubên sporê bibin qasidên aştiyê

**AMED -** Serok û nûnerên Arsînspor ya navçeya Trabzonê ku ji bo maça Kayapinar Belediyesporê hatibû Amedê beriya maçê çûn serdana Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr. Baydmîr got ku divê klubên sporê bibin qasidên aştiyê.

Serokê Kluba Arsînsporê Paşa Koç ku ji Trabzonê hatibû, serokê Kluba Araliksporê Ahmet Taştin û endamên lijneya rêveberiyê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr ziyaret kir. Şaredar Osman Baydemîr, serokê Kluba Buyukşehîr Belediyesporê Metîn Kilavuz, Berpirsiyarê Şaxa Futbolê Cemal Dogrul û Berdevkê Çapemeniyê Ekrem Yeşîl mêvanên xwe pêşwazî kirin. Baydemîr diyar kir ku ew ji ber vê serdana wan gelek kêfxweşbûne û wiha berdewam kir: "Hemû welatiyên vê erdnîgariyê heval in, dost û bira ne. Lê mixabin bi salan e hewl tê dayîn ku biratiya navbera gelan xerab bibe. Bê guman di vê mijarê de hinekî serkeftî bûn."

Baydemîr balkişand ser giringiya sporê û da zanîn ku divê klubên sporê bibin qasidên aştiyê û wiha berdewam kirin: "Em çiqas bên cem hev em dê ev qas hev û din fêm bikin. Li gorî min divê klubên sporê mîsyona qasidên aştiyê bigire ser xwe." Serokên klubê jî diyar kirin ku mixabin hin hevalên wan vê yekê fêm nakrin û gotin ku ew vegerin dê ji hevalên xwe re vebêjin. Nûnerên klubê Baydemîr ji bo xwarina hamsî tava vexwendiyê Trabozê kirin. Baydemîr bi mêvanên xwe re wêne kişand.